# welat

Sal:3 Hejmar:105 20–26 Reşemî 1994 10.000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

## Li navenda DEP'ê bombe teqiya

■ Li avahiya navenda Partiya Demokrasiyê roja 18'ê Reşemiyê, bi teqîna bombeyekê, li gor tesbîtên ewil du kes hatin kuştin, 17 kes jî birîndar bûn. Dema ku rojnameya me li ber çapê bû, li gor nûçeya ku ji Enqerê gihîşte destê me saet li dora şeş û nîvê êvarê li avahiya navenda DEP'ê ya li taxa Necatîbeyê, bombeyeke ku di qeta pêncemîn a asansorê de hatibû bicihkirin, teqiya. Di wê saetê de ji xeynî sih rêveber û personelên DEP'ê gelek kesên din jî li avahiyê hebûn. Piştî teqîna bombeyê hate tesbîtkirin ku du kes mirin, 17 kes jî birîndar bûn. Ji du kesên mirî navê yekî Ekrem Akçakaya, navê yê din hîna nayê zanîn. Kesên ku birîndar jî bûne ji bo tedaviyê li Nexweşxaneya Belediyeyê hatin razandin.

# Emniyeta Stenbolê Kurdan tehdît dike

***Kurd êdî li bajarên Tirkiyeyê jî, bi gefxwarinan re rû bi rû dimînin. Midûrê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzîr tevî Waliyê Stenbolê Hayrî Kozakçioğlu ve tiliya xwe bi ser Kurdan ve hejand û rik û kirra xwe da wan. Daxuyaniyên wî yên piştî bûyera Tuzlayê, ne ji xêrê re hatin şîrovekirin.***

***Gotinên ku ji devê Menzîr derketin, wek siyaseta dewletê ya li hember Kurdên ku li bajarên Tirkiyeyê dijîn hatin nirxandin. Welê dixuye ku, Kurd ji niha pê ve wê rehetiyê ji xwe re nebînin. Di pey her livbaziyekê de, êdî hedefên polîsan malên Kurdan in.***

*Rûpel 8*



*Her çiqas Kurdên li metropolan ji aliyê rêveberên dewletê ve bên tehdîtkirin jî, ew her tim ji bo mafên xwe yên neteweyî bi awayên girseyî têdikoşin.*



*Stêrkek Kurd li esmanê Erebî:*

## Selîm Berekat

***Jan Dost***

*Rûpel 13*



## Bêhna laşê lawiran kete nav bêhna giya

***Ebdulhelîm Yûsiv***

*Rûpel 12*

# Salvegera te pîroz be ey Welat

Tu dîrok î, tu çand î, tu wêje ya Kurd î,
tu nûçeyên cengê yî ey Welat.
Tu şehîd î Musa Anter, Huseyîn Denîz,
tu Kurd î, serbilind î, tu şervanê şoreşê
navê şîrîn î.
Ey Welat
Dermanê birîna reş î
Tu rûpelên zelal î
Tu welatê Kurdan î
Navê şîrîn
Ey Welat
Ez û tu wek goşt û hestî, bêyî hev nabin
Ez Kurdê bindest, tu rêzana azadî
Ez laşekî bêgiyan, tu rihekî nû ji esman
Peya bûy
Mêvanê laşê min bûy
Xwîna nû, navê şîrîn
Ey Welat
Tu bi xêr hatî jiyana min
Te ronahî kiriye mala min
Te pêxistiye çirûskên kesk û sor û zer
Wa li hişê min
Wa hişê ciwan û kal û pîr û zarokên
Welatê min
Salvegera te pîroz be navê şîrîn
Ey Welat
Tu dîroka kesaniya min zelal dikî
Û
ji agirê Çar Lehengan çirûskekê, li cegera
min dikî
Salvegera te pîroz be
Jiyan ji te re bi xêr be
Tu ji me re hezar salî bî
Navê şîrîn, navî şîrîn
Ey Welat
Hestî bêgoşt nabe
Laş bêjiyan nabe
Ez bêyî te, ez bêyî te nabim ey Welat
Ez bi te nêzî dîroka xwe me
Salvegera te pîroz be...
Ey Welat
Tu dengê berxwedana gelê Kurd
Tu dibistana Mahsum Korkmaz
Ji zarokên Kurdan re
Bijî her bijî...
Ey Welat
Tu bi kurmancî dikî hawar
Tu bûy kelem li çavên neyar
Govend digirî li hola şer
Tu Helepçe yî her Newroz
Tu her Newroz Mazlum Doğan
Tu Şirnex î
Tu Cizîr î
Tu Nisêbîn
Her Newroz
Tu dîroka zelalkirî, navê şîrîn
Ey Welat
Ka Zekiye, kanê Rehşan
Ka Koçgirî û Geliyê Zîlan
Palo, Darahênê û Serhildan ên çar aliyan
Ji îro ta hezar salan
Dûr nîn e Newala Qesaban
Tu dibêjî wa li nav rûpelan
Tu ronaya çar alî û çil milyonan
Salvegera te pîroz be, navê şîrîn...
Ey Welat
Kanê Komara Mehabad?
Kanê rastî, kanê çepî?
Kanê rastiya nîjadî?
Tu dibêjî: Wa li nav rûpelan
Ez diqîrim bi Kurmancî
Bi Soranî, bi Goranî
Bi Zazakî
Ez diqîrim bi Kurdî!
Tu dibêjî: Wa li nav rûpelan.
Salvegera te pîroz be, navê şîrîn...
Ey Welat
Çi bikim ez ne Cigerxwîn im
Ez evqasî diqedînim
Dergûşa te Ê. Egîd
Tu carî tu car bêyî te nabe
Ey Welat.

***Ê. Egîd/Melazgir***

# Divê Welat li rewşa gel jî bifikire

Gelî xebatkarên rojnameya Welat, berî ku ez dest bi nameya xwe bikim, ez gelek silav li we dikim û ji ber ku hûn xebateke gelêrî dikin, we pîroz dikim.

Ez xwendevanê rojnameya Welat im. Min ji roja ku Welat derketiye an ku ji hejmara yekemîn ta ya sedemîn xwendiye. Bi rastî min jê pirr feyde dît. Ez ji aliyê zimên, çand û hwd. ve pirr ronî bûm, anku gelek tişt hîn bûm. Gelî birayên delal, xebata we pirr baş e û daxwaziya min ew e ku hûn vê xebata xwe bidomînin. Ji ber ku ev xebat ji bo armanca neteweyî pirr girîng e.

Xebatkarên Welat li gorî lênêrîna xwe ez dixwazim çend gotin ji we re bibêjim. Birayê min heger hûn dixwazin bi alîkariya rojnameya Welat zimanê Kurdî di nav gelê me de bidine xwendin û nivîsandin û bi vî awayî gelê xwe bidin elimandin, girîng e hûn rojnameya Welat bikin mîna dibistanê. Dibe ku hûn bibêjin ma ne dibîstan e jî. Bi rastî dibîstan e. Lê hûn jî rastiya gelê me dizanin. Ji vî aliyî ve rewşa gelê me dişibe ya zarokên ber dibistanê. Sedemên vê yekê ji aliyê me hemûyan ve baş tê zanîn.

Gelê me rojnameya xwe, pirtûka xwe û hwd. bi zimanê xwe baş nikare bixwîne. Vê carê girîng e em çi bikin? Bi ya min divê di rojnameyê de dersên zimanê Kurdî bên dayîn û weşandin. Di rûpelekê de ev yek bê kirin dê baş be. Wê hêdî hêdî gelê me bielime xwendin û nivîsînê. Ez hêvî dikim ku, vê çaxê wê gelê me zêdetir rojnameya Welat bixwîne.

Ji aliyê din ve pêkenok, çîrok, helbest û hwd. jî her dem di rojnameyê de bila zêde cih ji wan re bê veqetandin. Dû re, berê di rojnameyê de ferhengok dihat weşandin. Lê ev çend hejmar e ferhengok nayê weşandin. Çima? Bi rastî mirovekî ku nû dest bi xwendina ronameyê dike, ferhengok zehf jê re girîng e. Bi xwe mîn gava dest bi xwendina Welat kir, ferhengok ji min re zehf bû alîkar. Ji ber vê yekê daxwaziya min e ku hûn dîsa wekî berê, di cihê berê de ferhengokê biweşînin .

Birayên min, dîsa zehf silavan li we dikim, bimînin bi kêfxweşî.

***Medî***

# Nivîsara Welat

## Tehdîtên Emniyeta Stenbolê

Êrîşên hêzên dewletê li hember gelê Kurd û saziyên Kurdan her diçe zêdetir dibin. Her cure metodên qirêjî tên bikaranîn li dij têkoşîna Kurd a neteweyî. Kuştin, sirgûn, talan, gund şewitandin, îşkence, girtin, gef, tehdît û hwd. Komara Tirk, wisa xuya ye ku, hêviya xwe yekcar ji Kurdan birriye, vêca ji bo wêrankirina Kurdistanê çi ji destê wê tê dike.

Di hefteyên dawî de êrîşên dewletê, li hember Kurdên ku, ji Kurdistanê koçberî metropolan bûne jî zêde dibin. Ji xeynî êrîşên kontrgerîla û faşîstên MHP'ê yên li hember welatparêz, DEP'van û rojnamevanan, gefxwarin û tehdîtên rayedarên dewletê jî bi awayekî eşkere xwe didin der. Waliyê Stenbolê Hayrî Kozakçîoğlu û Midûrê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzîr, piştî bûyera Tuzlayê, ku bi êrîşa hêzên ARGK'ê 5 xwendekarên leşkerî hatin kuştin, rasterast û bi şêweyekî eşkere, Kurdên metropolan bi kuştinê tehdît kirin.

***Em nizanin Emniyeta Stenbolê wê êrîşê ser çend malên Kurdan bike. Li Stenbolê li dora 3 milyonî Kurd dijîn. Wê çi bikin ji 3 milyon Kurdan? Wê dikaribin çend kesan ji wan bixin bin çav û bikujin? Wê sed kesan, hezar kesan an jî deh hezar kesan bigirin? Wan biavêjin hepsê û bikujin jî, dîsa du milyon neh sed û nod hezar Kurd dimînin. Wê bi vî awayî pirsgirêka Kurdî çareser bikin?***

Em nizanin Emniyeta Stenbolê wê êrîşî ser çend malên Kurdan bike. Li Stenbolê li dora 3 milyonî Kurd dijîn. Wê çi bikin ji 3 milyon Kurdan?

Wê dikaribin çend kesan ji wan bixin bin çav û bikujin? Wê sed kesan, hezar kesan an jî deh hezar kesan bigirin? Wan biavêjin hepsê û bikujin jî, dîsa du milyon neh sed û nod hezar Kurd dimînin. Wê bi vî awayî pirsgirêka Kurdî çareser bikin?

Li hember tehdît û hêrsa rayedarên dewletê, tenê kena mirov tê. Siyaseta wan siyaseteke pirr komîk e. Dixwazin bi çavtirsandinê Kurdan melahîm bikin. Ma ev metod berê jî nehatibû ceribandin û çiqas bi kêr hat?

Berê morala Kurdan li hember tehdîtên wiha xera dibû, lê îro Kurd ne bêxwedî ne, ne bi rêxistin in û kena wan bi gotinên wisa vala tê. Gelo piştî vê saetê Kurd wê ji çi bitirsin, gelekî ku her tiştê wî ji destê wî hatiye standin, wê êdî ji çiyê xwe bitirse? Di ser re jî, ku ev gel şiyar bûbe û hînê awayê têkoşîna ji bo mafên xwe bûbe.

### BERÊ WELAT KETE SALA SISÊYAN

Hefteya din, Welat 2 salên xwe temam kir, berê wê kete sisêyan. Di du salan de 104 hejmarên Welat derçûn. Di du salan de me çi kir û çi nekir, nirxandina wê emê bihêlin hefteyeke din, ji ber ku vê hefteyê cihê me têrî nake. Di sala sisêyan de, emê çi bikin an jî pêwist e em çi bikin, kêmasiyên me çi ne, emê li ser vê yekê jî bisekinin û li benda pêşniyarên xwendevanên xwe bin.

### CILDÊN WELAT

Heta niha, 3 cildên Welat (her yek jê 26 hejmaran e) derketine. Di rojên pêşiya me de emê cilda çaremîn jî derxînin. Xwendevanên me yên ku dixwazin cildên

**Mazhar Günbat**

# ERNK'ê çapemeniya dinyayê dawetî Kurdistanê kir

**Navenda Nûçeyan–** Nûneriya ERNK'ê ya Ewrûpayê daxuyand ku, dewleta Tirk di mehên zivistanê de bi operasyonên li ser gel, bi sedan mirovên sivîl kuştine û bi qasî wê hejmarê jî gund vala kirine. ERNK'ê, çapemeniya dinyayê jî dawetî Kurdistanê kir ku kirinên dewletê bi çavên xwe bibînin û li hemberî wan bûyeran bêdeng nemînin.

Nûneriya Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (ERNK) ya Ewrûpayê di 15.2.1994'an de bi nivîskî diyar kir ku, dewlet bi ser gel ve diçe, sivîlan dikuje, gundan vala dike û ji çapemeniya dinyayê dixwaze ku şerê li Kurdistanê taqîb bikin. Nûnerîtî bi berdewamî dibêje ku, di hefteyên dawî de valakirina gund û şewitandina wan zêde bûye û dadixuyîne ku di 11.2.1994'an de li Silopî 14 gundî ji aliyê hêzên dewletê ve hatine gullebarankirin.



*Çalakiyên ERNK'ê yên Ewrûpa bala raya giştî ya dinê dikişîne ser rewşa gelê Kurd.*

Di daxuyana nivîskî de li ser hilbijartinên 27'ê Adarê jî tê sekinandin û tê diyarkirin ku bi taybetî li Amed, Mêrdîn û Sêrtê di serî de li gelek deverên Kurdistanê, kesên ku berendamiya xwe ji bo serokatiyê kifş kirine têne girtin, îşkencekirin û gef li wan tê xwarin.

Nûnerîtî derdibirine (îfade dike) ku ev kirin bi dîrektîfên Serokê Leşkeriyê Orgeneral Doğan Güreş ve pêk tên û bi biryara wan î "qedandina hetanî biharê" ve girêdahî ye. Ji aliyê din ve, ev kirin wek paqijiya etnîkî tên nirxandin û ji sazî, rêxistinên demokratîk ên navneteweyî hişyarbûna wan î li hemberî bûyer û qewmînên li Kurdistanê tê xwestin û bi taybetî gazî li çapemeniyê tê kirin ku di dema hilbijartinan de herine Kurdistanê. Heta ji wan tê xwestin ku nûçevanên xwe bi timî li Kurdistanê bihêlin.

# PKK gotinên xwe tîne cih

**Navenda Nûçeyan–** Gefxwarinên PKK'ê têne cih. Serokê PKK'ê û rayedarên wê yên siyasî û leşkerî, daxuyandibûn ku wê li metropolên Tirkiyeyê dest bi livbaziyan bikin. Sebebê livbaziyan jî bi siyaseta dewleta Tirk a li Kurdistanê ve girê dabûn. Di sala nû de, di nav meh û nîvekê de bi tenê li Stenbolê 24 livbazî ji aliyê yekîne yên ARGK'ê û ERNK'ê ve pêk hatin. Di van bûyeran de 6 kes mirin 44 kes jî birîndar bûn. Livbaziya mezin jî ya Tuzlayê bû ku 5 serbazên (subay) yedek mirin, nêzîkî 30 kes jî birîndar bûn.

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, di gelek axaftin û daxuyaniyên xwe de dabû diyarkirin, heke cerd, pêkutî, tehde, şewitandin, kuştin, koçkirin û hwd. li Kurdistanê ji hêla hêzên dewletê ve bê pêkanîn, wê ji vê yekê re bêdeng nemînin û derbiriyabû ku wê ji bo misîlemeyê li bajarên mezin ên Tirkiyê livbaziyên mezin pêk bînin, ziyanê bigihînin avahiyên kevin, tûrîzm û ekonomiya dewletê.

Piştî van daxuyaniyan bi tenê di nava meh û nîvekê de li Stenbolê 24 livbazî pêk hatin. Şeş kes mirin, 21 berendamên serbazên yêdek, 5 polîs, 6 leşker, 2 jinên serbazan û 11 hemwelatiyê Tirkiyeyê birîndar bûn. Ji ber qewmînan jî gelek ziyana aborî (ekonomîk) jî çêbû. Ev livbazî bi giştî li qehwexaneyên ku polîs lê rûdinin, avahiyên MHP û RP'ê û li sazî û sazgehên dewletê pêk hatin.

Ev bîlanço tenê ji 1.1.1994' an ta bi 13.2.1994'an e. Di nav van bûyeran de ya herî mezin a ku di 12'ê Reşemiyê de li Stenbolê li Tuzlayê qewimî. Bombeya ku ji aliyê tîmên ARGK'ê yê metropolê ve di qutiya qirş û qalan de hatibû bi cihkirin, li îstasyona trênê teqiya, 5 serbazên (subay) yêdek mirin û nêzîkî 30 kes jî birîndar bûn.

Li ser bûyerê li Stenbolê polîs kitin alarmê û Mudurê Emniyetê yê Stenbolê Necdet Menzîr bi riya çapemeniyê daxuyand ku, wê heyfê li erdê nehêlin û her wiha geflêxwarinê jî, ji bîr nekin. Geflêxwarina wî wek qewmînên îşareta înfazên bêdaraz (bêmehkemekirin) hate nirxandin. Der û dorên rojnameya Aydinlikê jî rexne li kirinên bi vî awayî kir.

Wek tê zanîn dewletê bi Serokkomarê 8. Turgut Özal ve ji bo ku"ava masî bê ziwakirin" valakirina gundan xistibûn rojeva xwe. Her wiha pê didan ser gundiyan an wê cerdevantiyê qebûl bikin an jî wê gundê xwe terk bikin. Dewlet bi vî awayî dixwaze desteka ku gel dide gerîlayan qut bike û şervanên PKK'ê bênan, bêav bihêle û ji desteka lojîstîkî bêpar bike û wan bi serê wan bihêle. PKK'ê jî daxuyandibû ku kirinên dewletê yên bi vî şêweyî bidomin, ew jî wê bergeha şer wê fireh bikin û bigihînin hetanî rojavayê Tirkiyeyê.

## Tirkiyeyê ceza xwar

Gundiyên Yeşilyurta Cizîrê di doza xwe ya ku li hemberî dewleta Tirkiyeyê vekiribûn bi ser ketin. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê 900 milyon lirayê cirm li Tirkiyeyê birrî. Tirkiyeyê ev cirm qebûl kir.

Tê zanîn ku di Rêbendana 1989'an de di bin serokatiya serbaz "Binbaşî" Cafer Teyyar Çağlayan de, leşker li gundiyên Yeşilyurtê işkence kiribûn û bi fermana Çağlayan gû bi gundiyan dabîn xwarin. Gundiyan li ser vê yekê doz li serbaz vekiribûn û mesele li hundir û derve deng vedabû. Lê li Tirkiyeyê gundî bi riya dadgehê ne gihîştibûn armanca xwe.

Li ser navê gundiyan Abdurrahman, Bahattîn, Kamîl Muştak û Abdullah Gündoğan serî li Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê dabûn. Serîlêdan di Rêbendana par de ji aliyê komîsyonê ve hatibû qebûlkirin.

Bi encama vê biryarê re, meseleya "gû dane xwarinê" rast derdikeve û sûcdarîbûna Tirkiyeyê di warê binpêkirina mafên mirovan de careke din diyar dibe, hem jî bi awayekî fermî.

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## 'Kilamek ji bo Beko'

Huner xemla jiyanê ye. Hinek bi polîtîkayê, hinek bi pênûsê, hinek bi firçeyê, tembûrê.. û hinek jî bi çekê (sîlehê) jiyanê dixemilînin û bedew dikin. Gerîla jî hunermend e. Gerîlayetî hunerê dixwaze. Artîstek (Art=huner) li ser sehneyê, yan jî li pêşiya kamerayê, hunera xwe nîşan dide, li aliyê din gerîla ji bo afirandina mirovahiyeke azad hunera xwe li ser çiyan pêşkêş dike. Mebest ev e; jiyan bi xwe şêweyekî hunerê ye, di çarçoveya çend dengbêjan, çend leyîstikvan û çend şanogeran de, nirxandina hunerê (fenn) encameke berhemdar nade.

Elbete, nêrîna me ya li hunerê nêrîneke sosyalîst e. Di sosyalîzma de huner ji bo gel e, berevajiyê sîstema burjûvazî ya ku tê de huner ji bo hunerê ye.

Girêdayî vê nêrîna di der barê hunerê de, ez dixwazim di vê nivîsa xwe de li ser fîlma "Kilamek ji bo Beko" bisekinim.

Di roja 18'ê Çileyê de Kanala TV-ART (Almanî) programek li ser Kurdan weşand. Di nava wê bernameyê de fîlma Nîzamettîn Arîç "Kilamek ji bo Beko" jî hebû.

N. Arîç di fîlma xwe de, dest diavêje pirsgirêkeke gelekî pêwist, mixabin bi ser nakeve. Realîteya problemê nayine ziman. Di nava sînorekî teng de dizivire, diçe û tê, tiliya xwe nade ser birînê. Gelo, sedema dudilî û bêcesaretiya şîrovekirinê çi be? Di serê min de pirsek hişt.

***Di demeke wiha de, ku li bakurê Kurdistanê bi hezaran ciwanên Kurd tevlî gerîlayên ARGK dibin, Arîç pişta xwe dide wê rastiya eşkere û birayê xwe dişîne nava pêşmergeyan. Mirov nikare polîtîkayeke wisa teng û sivik bipejirîne. Lewma jî "Kilamek ji bo Beko", bi min xweş nehat.***

Beko (N. Arîç) kurê malbateke Sirûcî ye. Birayê wî Cemal Öztürk ji ber leşkeriyê direve. Berî ji gund derkeve wiha dibêje ji birayê xwe re: "Ezê biçim li Kurdistana başûr bibim pêşmerge, ezê tevlî pêşmergeyan bibim. Ez naçim leşkeriya Tirkan..." Xatirê xwe dixwaze û diçe. Di rê de tê girtin. Di operasyoneke li hemberî "qaçaxçiya" de tê kuştin. Haya Beko ji kuştina wî nîn e. Leşkerên Tirk diavêjin ser gund, Beko bi xwe re dibin. Bûyereke awarte derdikeve, Beko direve. Bi pey birayê xwe dikeve, ava Ferêt derbas dike û xwe digihîne Başûrê Biçûk ji wir bi riya rêberan diçe Başûrê mezin... Di nava pêşmergeyan de birayê xwe nabîne, ji wir xwe digihîne Almanyayê. Diçe şevekê, agahdar dibe ku birayê wî hatiye kuştin... Fîlm bêyî ku pirsgirêkê çareser bike, diqede.

Ez gelekî li ser teknîk û zimanê fîlmê ranawestim. Helbet ji hêla montaj, diyalog, doblaj û hwd. kêmasî zehf in. Ji wê bêhtir ez şîrovekirin û rawestandina li ser senaryoyê pêwîst dibînim.

Li vir ez dipirsim: Sedema ku N. Arîç berê C. Öztürk dide başûrê Kurdistanê çi ye? Kesê ku ji Sirûcê be, nexwaze di artêşa Tirk de bibe leşker, wê tevlî gerîla bibe, yan jî sînor derbas bike û biçe li Başûr bibe pêşmerge?! Nabe gerîla, Cemal dixwaze bibe pêşmerge, gelo piştî 85'an çend ciwanên Sirûcî di nava pêşmergeyan de cih girtine, çend jî bûne gerîla? Egera (sebeba) ku Arîç vê rastiyê nayine ziman çi ye?

Di demeke wiha de, ku li bakurê Kurdistanê bi hezaran ciwanên Kurd tevlî gerîlayên ARGK dibin, Arîç pişta xwe dide wê rastiya eşkere û birayê xwe dişîne nava pêşmergeyan. Mirov nikare polîtîkayeke wisa teng û sivik bipejirîne. Lewma jî "Kilamek ji bo Beko", bi min xweş nehat.

Çend xalên din jî hene, bala min kişandine ser xwe: Ji gundiyekî bêhtir Beko rola rewşenbîrekî şareza û zana dileyîze.

Hem bi şêweyê axaftinê, hem bi danûstandinên bi gundiyan re, hem jî bi karyara xwe, Arîç rola Nîzamettîn Arîç dileyîze, ne rola Beko. Ji her kesî bêhtir xwe aniye ziman. Fîlm ne balkêş e, zeman û cihê bûyeran hev nagirin, ziman qels e, her kes bi zaravayê Serhedê diaxive, kişandina dîmenan lawaz e.

Û... Kilama "Kilamek ji bo Beko" li guhê mirovan xweş nayê.

*Berendama DEP'ê ya Zeytînbûrnû Nurhayat Îşyapan:*

# 'Emê li hember zilmê têbikoşim'


**Bayram Nêrgiz**

10'ê Reşemiyê DEP'a Zeytînbûrnûyê ya bajarê Stenbolê şeva hevgirtinê û dostaniyê li dar xist. Di şevê de gelek DEP'van derketin pêş beşdaran axivîn, nêrîn û berendama xwe dane nîşan. DEP'a Zeytînbûrnûyê ji bo serokatiya belediyê yeke Tirk binavê xwe Nurhayat Îşyapan berendam da xuyan.

Nurhayat Îşyapan di axaftina xwe ya şevêde wiha xwe bi gel danasîn: "Ez di 1958'an de hatime dinê û ji Bîgaya Çanakkaleyê me. Ez dozger (sawcî) bûm û li gelek deverên cur be cur min wezîfe kiriye. Di demên ku min wezîfeya xwe dikir de, min gelek zilm û kotekî bi çavên xwe dît. Ez niha abûqatiyê dikim û endamê DEP'ê me. Ji ber ku DEP, ez wek berendama belediyê hilbijartim, gelek spasdar im û ji niha pê ve ez dê li hember zilm û zoriyên ku li gelên bindest têne kirin têkoşim."

Serokê DEP'a Zeytînbûrnûyê Cemal Çoşkun jî di şeva hevgirtin û dostaniyê de peyivî û li ser şertên ku partiya wan daye afirandin rawestiya.: Çoşkun derbir ku li gel û endamên partiya wan jî pest the meşandin hu gotinên xwe wiha domand: "Ji dîroka komarê ta niha bi polîtîkayên çareserî li meseleya Kurd nehatiye nêrîn, ji xeynî çareserkirinê dewlet bêhtir zilm û zorê bi çavê hikimdariyê li pirsgirêkan nihêrtiye, ta îre. Ji ber van sedeman DEP derketiye holê û li mafê gelên bindest xwedî dertê û mafê gelê bindest diparêze.

Deftergirê DEP'a bajêrê Stenbolê Şemsettîn Kara jî dêhn û balê kişande ser soz û gotinên ku serok û rayedarên partî û berendamên partiyên sîstemê û rexne li wan girt. Kara daxuyand ku tenê dikarin sozê anîna demokrasiyê bidin. Şemsettîn Kara wiha peyivî : "Pêşî ez şeva DEP'ê pîroz dikim. Hingî ku dibêjin demokrasî heye û em demokrat in ku dengên xwe bidin me, em dê riyan, dibistanan, nexweşxaneyan çêkin û hwd... Van sozan didin gel, lê nayînin cih. Ê me tu tiştê me tune ku em bidin we, em nikarin derewan bidin xelkê. Incax demokrasiyeke rast, mirovperwerî û sozê biratiya gelan bidin, ji van pê ve tiştên me yên derewîn tune. Ji xeynî van jî, em nikarin zêde mijûl bibin, di vê demokrasiya wan a fireh de hingî fireh e ku mirov çi dibêje pît bi pît dinivîsînin: A B C Ç......."K"ya (Kurd) ku dîtin, dotira rojê mirov li dadgehê ye. Hûn kî dixapînin. Ev ne demokrasî ye, incax demokrasiya generalên fikirgenî be, em vê demokrasiyê naecibînin û em dê demokrasiya rast bînin."



*Şeva hevgirtin û dostaniyê bi kêf û şahî derbas bû.*

Komên ku beşdarî şevê bûn ev in: Özgür-SA Folklor Folklora DEP'a Zeytînbûrnûyê
Grup Dînmeyen
Koma Çiya
Zuğaşi Berepe (Koma Lazan)
Koma Amed
Grup Mûnzûr
Özgürlük Türküsü

# Ji bo Kurdên girtî piştgiriya navneteweyî

**Navenda Nûçeyan–** Banga ku ji aliyê "Hewldana piştgiriyê ji bo Kurdên li Fransayê girtî" hatibû kirin aligiriyeke mezin dibîne. Ên ku bersiv bi erênî (pozîtîf) dane ev in: Derhêner (rejîsor) Costa Gavras, Serokê Medecîn Du Mode (Doxtorên Dinê) Bernard Grangeon, Sekreterê Herêmî yê CHT'ê (Sendîkaya Karê Giştî) Dîdîer Nîels, Nivîskar Gîlles Perrault, dîrokzanê Frnsiz yê bi nav û deng Prerre Vîdal–Naquet, bestekar– muzîsyen Colet Magny, Alîkarê Serokê Komela Mafên Mirovan Abûqat Jean–Waeques da Felîce û gelek hunermendên din.

Li gorî daxuyaniya van kesan, ji bo berdana Kurdên ku niha girtî ne, wê têkevin nav hewldanakê.

Li aliyê din rayedarên Rêxistina Biratiya Gelan a li dijî Nijadpestiyê Alaîn Calles, daxuyaniyek li ser vê hewldanê da. Calles, bi kurtasî armanca vê hewldanê wiha şîrove kir: " Ji bo berdana 14 Kurdên ku di girtîgehên cihê cihê de ne û rakirina îkameta mecbûrî ji bo hinek Kurdan û ji bilî van daxwazan jî, ji bo rakirina qedexeya li ser komeleyên Kurd û ji bo hildana gefwarînên li ser Kurdan, di warê derîsînorkirina ji Fransayê."

# Îp'ê berendamên xwe kifş kirin

**Navenda Nûçeyan–** Berendamên navçe û bajarên Stenbolê yên ÎP'ê (Partiya Karker) di 17.2.1994'an de ji aliyê Serokê wê yê Giştî Doğu Pirinçek ve hatin diyarkirin.

Doğu Perînçek piştî danasîna berendaman got ku, "Êdî sîstema Tirkiyeyê îflas kiriye. Pêwistî bi guherîneke heye, partiya me jî, bi partiya TSÎP'ê (Partiya Karkerên Sosyalîst a Tirkiyeyê) re protokol çêkiriye û wê bi hev re beşdarî hilbijartinê bibin."

ÎP di temamî navçe û beldeyên Stenbolê de berendamên xwe kifş kiriye û di nava berendamên wê de, wek dozgerê teqawîtbûyî, rojnamevan, esnaf û herî zehf jî, %48 berendamên wê karker in.

ÎP ji bo berendamiya belediyeya bajarê Stenbolê ya mizin jî Arslan Kiliç da nîşan.



*Doğu Perînçek*

# Hewlên ajankirina girtiyan

**Navenda Nûçeyan–** Li Îzmîrê li Girtîgeha Bûcayê jî, Rêveberiya Girtîgehê li pey ajankirina girtiyan e. Kesên ji aliyê dadgehê ve têne girtin, li Girtîgeha Bûcayê di nav girtiyên adî de têne bicihkirin. Tevî ku ev girtî bi daxwaznameyê ji rêveberiyê dixwazin herine nav girtiyên siyasî, îdareya girtîgehê wan di nav girtiyên adî de dihêle û bi alîkariya îtîrafkar Revzat Turan dixwaze ku qawîşeke îtîrafkaran li girtîgehê pêk bîne.

Li gorî ku Nurettîn Demîrtaş li ser navê dîlên PKK'yî radigihîne, li gel hemû hewlên girtiyan ên ji bo ku herine qawîşa siyasiyan, îdareya girtîgehê rê nade. Demîrtaş dadixuyîne ku Rêveberiya Girtîgehê bi navgîna îtîrafkar Revzat Turan hewl dide ku qawîşa îtîrafkaran çêbike. Heta tê diyarkirin ku tehde li kesên Beşa Nû Qawîşa 15. tê kirin ji bo ku bibine ajan û îtîrafkar. Ew kesên ku xwestine ji Qawîşa 15. derkevin ev in. A.Rahman Aksu, Pîro Karataş, Burhan Erdem, Nîhat Tokman, Bayram Ekelîk, Sadî Kaya.

Nurettîn Demîrtaş diyar dike ku, Necla Erdem bi du caran bi riya daxwaznameyê serî li Rêveberiya Girtîgehê daye ji bo wê bidine qawîşa siyasiyan, lê tu encam bi dest nexistiye. Her wiha ebûqatê Erdem Bayram Özcan jî da nîşan ku, bi awayekî zanebûn pest li girtiyan tê kirin, di nav girtiyên adî de têne hiştin û ji bo ku wan bikine ajan her tişt li wan tê kirin.

Li ser navê PKK'yiyên dîl Nurettîn Demîrtaş, dadixuyîne ku ji vê yekê Dozgerê Girtîgeha Bûcayê Yaşar Aslan berpirsiyar e û gazî li hemû kesên welatparêz, demokrat û pêşverû tê kirin ku haya wan ji vê rewşê hebe.

*Ji devê nûçevanê Gündemê Îsmaîl Ersöz serpêhatiyên wî yên li qereqola Wanê*

# 'Yên têne vir an dipeyivin an jî dimirin!'



**Îsmaîl Ersöz**

*Roja 23.1.1994'an saet li dora yek û nîv polîsan ez birim dadgehê û ez serbest berdam. Polîsan ez rehet bernedam, lewma ji min re digotin "Wanê terk bike." Roja 31.1.1994'an ji bo tedaviyê min biletê teyarê ji xwe re stand da ku werim Stenbolê. Ji firîna teyarê re 5 deqîqe mabû, min xwe li piya nedigirt. Dev û rûyê min werimîbû şeva çûyî ta sibehê ez nikaribûm rakevim, her derê min werimîbû di vî halî de bi alikariya hevalekî çûm balefirgehê. Polîsan hatin ez û hevalê min dîsa xistin bin çavû avêtin hucreyê.*

Roja 9.1.1994'an polîsên Antî–Terorê yên Rêveberiya Asayîşa Wanê girtin ser buroya me. Bi mebesta îfadegirtinê polîsan ez û neh xebatkarên Özgür Gündemê birin qereqolê. Dema em birin, di rê de polîsan tehdayî li me kir û em tehdît kirin. Da ku cardin em rojnameya Gündemê belav nekin, bi kulma li ser û çavên me xistin.

Piştî ku em birin qereqolê, îfadeya me girtin, heşt hevalên min serbest kirin, ez bi tenê mam. Wan ez xistim hucreyê û çar polîsan êrîşî ser min kirin, bi çêr û gefxwarinan pirr li min xistin û gotin: "Ku tu dev ji vî karî bernedî, emê kilsa sipî bidin te, ji ku tu bi fetisî. Yan tu yê ji me re bixebitî an jî tu yê ji Wanê derkevî." Dawî cil, saet, nasname û milyonek û nîv pereyên min ji min standin û derengê şevê ez serbest berdam.

Roja 19.1.1994'an li Meydana Cumhuriyetê dîsa zilamekî sivîl kete milên min û got: "Tuyê bi min re bêyî." Min jî got: "Tu kî yî?" Min ji nûnerê buroyê, Bülent pirsî ka ev kî ye, wê min bi ku ve bibe? Wî jî got: "Xeletiyek di nasnameya te de heye, wê ta qereqolê te bibe."

Pişt re wî zilamî bi telefonê gazî polîsan kir ku werin min bibin. Di erebeyê de gelek heqaret li min kirin. Piştî nîv saetî bi erebeyê ve ez birim şubeya "Tekoşîna bi Terorê re." Heta em gihîştin wir, di erebeyê de li min xistin. Çawa ez di deriyê avahiyên polîsan re derbas bûm çavên min girtin. Li hundir ji min re gotin,"Emê te bikujin yên têne vir an dipeyvin an jî dimirin." Ger tu bipeyivî tê bê berdan û kes nikare têkildarî te bibe. Em dizanin tu çi karî dikî. Birayê te endamê PKK'ê ye.

Dema min pêşniyara wan nepejirand bi kulm û jopan li min xistin û gotin emê te înfaz bikin. Û ji bo ku moralê min xera bikin digotin: "Birayê te di şerekî de hatiye kuştin, birayê te yê din jî doh êvarê hatiye înfazkirin, emê te jî wek wan bikujin.

Dû re ez avêtim hucreyê. Bi lêdana radyoyê min bihist saet 9 e. Dîsa hatin ez birim ji bo pirsiyariyê. Vê carê gotin "Li Wanê karên rêxistinî tu dikî, xortên vir tu dişînî çiya", û hwd. ku min got: "Na." Înca kincên min ji min xistin û bi "daleqana filîstin" li min îşkence kirin. Pêvajoya saet û nîvek bi vî halî ez hiştim, ava cemidî li min kirin. Rêvebirê têkoşîna bi Antî–terorê re digot. Rêvebirên vir ez im, her tişt ji min tê pirsîn, ger tu bipeyivî ezê te berdim." Ku min got: " Ez tiştekî nizanim" Cardin îşkence li min kirin. Bi vî awayî pênc (5) rojan dom kir. Curreyên îşkenceyên wan, daleqana filîstin, ava sar û boş, di nava avê de torbe xistina seriyan û "tecawûza bi jop" hebûn. Di vê demê de jî bi gav û saet lêdan kêm ne dibû. Ya herî xerab jî, muzîka ku lê dixistin, ji temamî îşkenceyan xerabtir bû. Piştî ku avê li min wiha dikirin ez davêtim hucreyê birçî û bêxew dihiştim.

Roja 23.1. 1994'an saet li dora yek û nîv polîsan ez birim dadgehê û ez serbest berdam. Polîsan ez rehet bernedam, lewma ji min re digotin, "Wanê terk bike."

Roja 31.1.1994'an ji bo tedaviyê min bileta teyarê ji xwe re stand da ku werim Stenbolê. Ji firîna teyarê re 5 deqîqe mabû, min xwe li piya nedigirt. Dev û rûyê min werimîbû, şeva çûyî ta sibehê ez nikaribûm rakevim. Her derê min werimîbû di vî halî de bi alikariya hevalekî çûm balefirgehê. Polîsan hatin ez û hevalê min dîsa xistin bin çav û avêtin hucreyê.

Piştî saeteke din çûn rojnameya Özgür Gündemê ànîn û manşeta wê nîşanê min dan û gotin: "Me ev li te nekiribû, li niha emê li te bikin." Û li min xistin. Gotin: "Me ji te re negotibû ku tu vê nûçeyê bidî Gündemê emê dîsa te bînin vir." Û dîsa li min dan.

Paşî, ji bo ku em biçin doktor, li erebê siwar kirin, di rê de dîsa tehdît kirin ku, li cem doktor tiştekî nebêjim. Ez birim çend doktoran jî, raporê saxlem nedidan, lewre carina dengê doktoran dihate min, digotin: "Felek bavê wî be, cardin sax nabe, ev kes ji miriyan xerabtir bûye. Ger ku raporê saxlem bidim wî, ezê ji karê xwe bibim." Polîs hêrs dibûn û li min dixistin. Paşî ez birim cem doktorekî faşîst. Doktor li rûyê min nêrî û got: "Tiştekê te tune, tu saxlem î" û rapor îmze kir. Dawî dîsa wan ez anîm avêtin hucreyê. Li gor xwe îfadeyek nivîsîn û anîn bi zorê bi min dane îmzekirin. Piştî bi du rojan jî ez berdam.

# 'Ji bo dersên Kurdî pêdivî bi mamosteyan heye'

## *Lêpirsîna kursên zimanê Kurdî*

*Li ser meseleya vebûna kursên zimanê Kurdî ev çaremîn hefte ye ku em dîtin û pêşniyarên xwendevanên Welat û yên ku li derdora DEP'ê ne, distînin. Ji dîtin û pêşniyarên ku heta niha me di rojnameyê de weşandine, derdikeve holê ku gelek kes vebûna kursan baş û pêwist dibînin. Hin ji van kesan jî dixwazin ku bi lezgînî ev faaliyet bê lidarxistin. Lê tenê bi gotin û guftugoyan pêkanîna tiştekî wisa ne mimkûn e; ji bo faaliyeteke wisa cih, mamoste, malzeme û organîzasyonek pêwist e. Kesên ku vê daxwazê dikin di wê dîtin û baweriyê de ne ku, DEP dikare bi alîkariya rojnameya Welat û Enstutiya Kurdî organîzasyona kursên zimanê Kurdî çêbike. Ji ber vê yekê, vê hefteyê me ev mesele ji rayedarên DEP'ê yên Stenbolê re jî vekir û li ser zehmetî, dijwarî û pêwistiya vî karî me dîtinên wan standin.*

*Hûn serokê DEP'a Emînönüyê ne, der barê vebûna kursa zimanê Kurdî de çi difikirin ?*

**Îbrahîm Yaman** *(Serokê DEP'a Emînönü)* Bi rastî, ji teref gelê Kurd ve vebûna kursan zehf dereng maye. Bi min ku mirovên gihîştî, di vî warî de li ser vê rewşê bisekinin wê baş bibe û ez terefdarê vebûna kursê me. Ji bo tîraja Welat û baş têgihîştina rojnameyê jî vebûna kursan girîng e. Ku wextê min hebe ezê jî herim kursê.

*Bi dîtina we kurs li ku derê vebin minasîb e?*

– Kurs divê li cihekî wisa vebe ku gel bikaribe xwe bigihînê. Divê cihekî wisa vebe ku Kurd li wir pirr bin, pêwist e ku cihê wê ji nêzî kursiyeran be ku zehmetiyan dernexe holê.

*Li pêşiya vekirina kursên zimanê Kurdî wê dewlet astengiyan dernexe?*

– Ez ne bawer im ku dewlet ji bo tiştekî wisa destûrê bide. Dewletê destûr nedida rojnameya Welat jî, lê belê dîsa jî vebû. Divê em li ber xwe bidin û têbikoşin, da em bidin vekirin. Jixwe dewlet hê jî dibêje Kurd tune ne, pêwist e ku em xwe û kultura xwe bidin pejirandin. Em, DEP'a Emînönü bi her awayî ve amade ne ji vekirina kursan re û çi wezîfe dikeve ser me, em dê bi dil û can bikin.

*Ji bo vekirina kursên zimanê Kurdî hûn çi difikirin û li ku derê dikarin bên vekirin?*

**Özcan Kiliç** *(Serokê DEP'a Fatîhê)* Belê, pêlekî li KMM'ê (Komeleya Mafên Mirovan) kurs hebû, lê demeke kurt dom kir. Ez dizanim niha li NÇM'ê (Navenda Çanda Mezopotamya) kursan didin, lê ez nizanim bi çi awayî ye. Dersê Kurdî jî wek dersên Îngilîzî, Almanî dikare bê dayîn. Dema ku dersê Kurdî bê dayîn, divê bi sîstem bê li darxistin, di hefteyê de du roj yan jî sê roj bê eyarkirin. Lê mamoste tune ne. Ji dayina dersê Kurdî re divê mirovên gihîştî û zane hebin. Ez bawer im vê pêşkêşiyê NÇM û Enstutiya Kurdî dê bikaribin bikin.

*Yanî hûn didin xuyan ku "NÇM û Enstutiya Kurdî" divê vê berpirsiyariyê bigirin ser xwe?*

– Nexêr, rojnameya Welat jî dikare bigire ser xwe, lê belê ji vî karî re mirovên hoste an jî yên ku belgename û destûrnameyên wan yên perwerdehiyê hebin, çêtir e ku kesên wisa ders bidin.

*Hûn vê daxwaza gel çawa dibînin û bi dîtina we ya dayina dersan, li DEP'an minasîb e?*

**Hayrettîn Al** *(Endamê Rêvebiriya DEP'a Fatîhê)* Belê minasîb dibînim, lê cihekî serbixwe be çêtir e, ji ber ku kurs dikare bibe sedema radana partiyê. Dewlet bi hinceta propagandaya ziman û kultura Kurdî dikare partiyê (Partiya Demokrasiyê) rade.

*Ji bo ku kurs vebin û ziyanê nede partiyê, mirov dikare çi bike?*

– Em incax dikarin bi formuleke wek xebata komîsyonên partiyê dersên Kurdî bidin.

*Ku wek xebateke kulturî ya komîsyonan be, dewlet têkiliya xwe jê nayine?*

– Nexêr, nayine. Ez bawer im di vê çarçoveyê de em dê karibin vî karî bimeşînin.


*Ev demeke dirêj e ku gel daxwaza perwerdehiya zimanê Kurdî dike li navçeyên DEP'an. Hûn wek Serokê Giştî yê bajarê Stenbolê, dikarin dîtinên xwe li ser vê mijarê ji me re diyar bikin?*

**Kemal Parlak** *(Serokê DEP'a bajarê Stenbolê)* Helbet zimanekî Kurdan heye ku jî bîr bûye, hatiye asîmilekirin an jî bi awayekî asîmilekirinê hatiye jibîrkirin. Mafê her kesekî heye ku zimanê xwe yê zikmakî bizanibe û fêr bibe. Ev mafekî ji xwezaya mirovan e. Kultur, huner, helbest bi zimên ve girêdayî ne. Ji bo pêşvebirina van divê hinek rêxistinên wek çandî û hunerî vebin.Tiştên wiha di planên me yên pêşerojê de hene. Helbet bi awayekî siyasî, dewlet dê bi wek hincetên îlegal bixwaze û li hember derkeve.

*Ger li avahiyên DEP'ê kursên zimanê Kurdî bên vekirin, wê zerarê nede partiyê, yanî wê dewlet vê yekê wek faaliyeteke îlegal nikaribe binirxîne?*

– Li gorî zagonan, partiyek dikare wek beşekî kulturî, ziman jî bide hînkirin, çawa yek dixwaze zimanekî biyanî fêr bibe an jî zimanê xwe yê biyanî berfireh bike, dikare zimanê Kurdî jî, bi vî şeklî fêr bibe, an jî berfireh bike.





**Serokê DEP'a Emînönü Îbrahîm Yaman û Serokê DEP'a bajarê Stenbolê Kemal Parlak**



**Serokê DEP'a Fatîhê Özcan Kiliç û Endamê Rêvebiriya DEP'a Fatîhê Hayrettîn Al**

**Neqtik**



*Heke ziman bihele, bûn û mayîn jî, ji navê radibe.*

***Hejar***

**KÊ ÇI PEKAND?**


**"Ez ne Kurd im, lê ez Tirkê Zaza me."**

*Edîp Sedat Bucak*
*(Mebûsê Ruhayê yê DYP'ê)*

# Tolazê Kurdan kralê Tirkan e

Belê, em kada (behsa) tolaz û kralan dikin. Tolaz ji mirovên ku ne bi kêrê xwe û ne jî bi kêrî hevalên xwe tên gotin. Tolaz bi awayekî ne kar ne xebat dike beleder dijîn nexasim jî, jiyaneke komforable (hêsan) dixwazin. Ev kêsên han ne hewçend zane ne jî, lê xwe ji her kesî çêtir û bêtir dizanin. Wek ku dibêjin: "Ne hêja me libek genim bi dinya alem tev dikenim".

Kral di dinyayê de ji aliyê herkesî ve tê naskirin ku mirovekî hikimdar e û li Bircê dijî. Xulam, Suxrevan, Rêncber û Leşkerên wî hene. Kral Wateya Key, Qran, Paşa, Şah û Padîşahan e. Ev kesên han, ji aliyê dinyayê ve têne naskirin, lê mirov ancax Tolazan di warên wan de nas dike. Ji ber ku, tolaz yên xwarinê, kêfê, xweşiyê û betaliyê ne, bi kurtasî tirşikçî ne. Înca em werin ser mijara tolaz û kral, hewçend tolazên me Kurdan hene, ku rûpelên rojnameyê ne kafî ye ji hejmarên navên wan re, ku mirov binivîsîne. Lê navên çend kesan jî em binivîsînin baş dibe, wek Îzzet Altinmeşe, Burhan Çaçan, Mahmut Tuncer, Balkiz Akkale, Salahattîn Alpay, Ferhat Güzel, Emrah û îro jî Mahsûm Kirmizigül Kralê Tirkiyeyê ye.



*Alem ev be, Kral ew e...*

- Mahsum Kirmizigül çawa bû Kralê Tirkan û Tirkiyeyê. Helbet bi aqilê xwe bû kral, çiqas jî tolaz bû, pariyek wî jî aqilê hebû û şixûland, ji bo bibe kralê Tirkiyeyê. Mahsum Kirmizigül nihêrt, ku Stranbêjên Tirk yên pop'ê zirtpirt stranan dibêjin û gelê Tirk ji stranên wan hez dike. Mahsum jî çû cem hemşeriyê xwe yê Mêrdînî û li wî şewirî ka, hemşeriyo bibêje em çi bikin, ez bibêjim.

Hemşeriyê min hema tu bibêje "Alem buysa kral benim ". Cewaba hemşerî ne hewçend aqilmendî bû, lê ji bûna kral ji Tirkiyeyê re gelek baş bû.

Belê, "Alem buysa kral benim". bû, ku Mahsum Kirmizigül kiribû kral. Lê .ev gotinên han, ji mêj ve di gel jixwe hebûn wek digotin. Ondan Başbakan olursa benden Cumhurbaşkani olur (Ku ew bibe Serokwezîr ezê bibim Serokkomar) Ondan şöför olursa benden pîlot olur (Ku ew bibe şofêr, ez dê bibin pîlot) Ondan Amîr olursa benden, de kral olur (Ku ew bibe Ami,r ez jî bibim kral ). Belê, ew kral e û bû kral. Kraliyeta wî li Tirkiyeyê pîroz be, lê tiştek heye ku mirov pê diêşe Tolazên me ji xelkê re ne, ne xweş e. Kralê Tirkan! Ku "Alem ev be kral tu yî Mahsum"!. (ji qata qûta zilaman navê pişo danîn Evdilrehman).

***Cejn Keyan***

*Pêkeniyek ji dora Serhedê*

## KÛÇIKÊ SERBAZ JÎ TIRK E!

Xortekî Kurd di leşkeriya xwe de ji kûçikê serbazekî re berdestî (xizmet) dikir. Tirkî nizanibû.

Serbaz rojekê kepê xwe diavêje û deng li kûçikê dike: "Kepîmî getîr Tonî." Kûçik radihêje kep tîne.

Serbaz vedigere li zilamekî ku bi Tirkî dizane re: "Bu salağa söyle bakayim benim köpeğim bile Türkçe biliyor. Üç ay oldu, neden hala öğrenemedi? (Ji vî ehmeqî re bibêje ku kûçikê min jî bi Tirkî dizane. Ev bû sê meh çima hîna jî hîn nebûye?)"

Ê Tirkî dizane ji xort re dibêje. Xort wilo bersiva wî dide: "Ji serbaz re bibêje, weleh kûçikê wî jî Tirk e."

*Ji dora Gimgimê çend pêkenok*

## ŞAGIRT Û MAMOSTE

Rojekê hêzên dewletê diavêjin ser gundekî, yuzbaşî (Serbaz) bang li şagirtekî dike. Li deftera wî ya sûretan mêze dike çi binihêre tev kesk, sor û zer in, xulqê wî teng dibe, madê wî tal dibe, wilo dibêje: "Kê ev ravî te kir?"

Şagirt: "Mamoste"

- Navê mamosteyê te çi ye?
- Edîp.
- Edîp.. Himm...

Yuzbaşî li benda mamoste disekine. Paşê diçe. Mamoste tê bi her tiştê dihise.

Roja înê bi êvarê re zarokan dikin rêzê. Ewê "îstiklal marşi" bidin xwendin Keçikek elbê wê di destan de ye diçe avê. Kenê xwe bi mamoste tîne û wilo dibêje: "Edîp Xoce, wele tu "Korkma sönmez" bidî xwendin, nedî xwendin yuzbaşî (serbaz) tê!"

## ANNEM TIR! BABAM TIR!

Yekî gundî diçe dibistanê wê demê mamosteyan tim dipirsiye: "Hûn kî ne?" Rojekê ji Nisreddîn dipirse: "Kurê min tu kî yî?"

Nisreddin radibe û bi dengekî bilind bersiv dide: "Annem tir..! Babam tir... oğlî tir...!"

## QASÎ XWEDE BA MA

Li derê dibistanê mamoste ji avahîçêkir re got: "Xwedê ji te razî... Te pirr xweş çêkir der û dora dibistanê"

Avahîçêkerê gundî bersiv dide: "Qasî xwedê xurt bûma, bi Xwedê jî bi pêxemberê Xwedê jî min tu dibistan li welatekî nedihîşt."

*Ji dora Çepexçûrê pêkeniyek*

## DAPÎ Û BAGER

Ji vir deh donzdeh sal berê rojekê, zilamek di êlê de disekine. Hingî gerîla (zarê serê çiya, talebe, heval) jiyanê edilandibûn, xweş kiribûn, mirov piştrast bûbûn.

Warê me li zozanên Çepexçûrê ye. Rojekê bi êvarê re heft heşt peya hatin êlê. Jin û zarok lê tov bûn. Hinek pirr şa bûn, hinek jî, ji tirsa hêzên dewletê tebat ne dikirin cur bi cur dîz (vexwarin) çêkirin. Hinekan pêjek qelandin, hinekan goşt qelandin û hinekan jî rûnê nivîşk, toraq kirin nav hev ji bo ku bi xwe re bibin.

Hevalan xwarin xwarin. Piştî xwarinê çay vexwarin. Emînê ji serokê wan pirsî: "Keko ez bi qurbana we, hûn mezin in, lê ev hevalê we yê biçûk çerçawa îdare dike?" Madê Bager tal bû, lê dîsa nedixwest dilê pîrekê bişikîne. Serokê komê bersiv da: "Dapîr, navê wî Bager e. Diya wî çar lawên xwe da welatê xwe. Rojekê ser û guhê wî şuşt. Pot lê kir û got: "Here lawê min Xwedê şixulê te rast bîne."

Xof, tirs û ecêbmayînî Emîne girt. Xwe ranegirt: "Pepûk ez im, tu rast dibêjî?"

Serokê komê: "Ez rast dibêjim. Ji diya wî, yê mîna wê çêdibin. Ji te jî yê mîna te çêdibin dapîr."

**Berhevkar: Jêhat Gimgim**

**Jûjî...** **Doğan Güzel**



# Emniyeta Stenbolê Kurdan tehdît dike

**Navenda Nûçeyan–** Mudurê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzîr bi awayekî diyar gef li Kurdên ku li Stenbolê dijîn, xwar. Ev gefxwarina xwe, li ser bûyera Tuzlayê di gel Waliyê Stenbolê Hayrî Kozakçioğlu diyar kir û gote ku kesên sûcdaran bihewînin ewê jî hesab bidin. Civîna ji bo çapemeniyê li Walîtiya Stenbolê li dar ket.

Necdet Menzîr di pey bûyera Tuzlayê de, Kurd ên ku li Stenbolê dijîn wek hedef da nîşan û daxuyaniya wî ji aliyê gelek kesan ve mîna peyamberî înfazên bêdaraz (bêmehkeme) hate şîrovekirin. Menzîr berê jî piştî livbaziyên rêxistinên sosyalîst daxuyaniyên bi vî rengî dabûn çapemeniyê û di pey de gelek cinayet ji aliyê polîsên pêgirê "Şaxa Têkoşîna bi Terorê" ve, çêbûbûn.

Di civîna ji bo çapemeniyê ya li ser bûyera Tûzlayê de Menzîr di gel Hayrî Kozakçioğlu, bi hêrs peyivî û li gelê Kurd ên ku li Stenbolê dijîn, deng kir ku kesên bi guman nehewînin, heke na wê bêne cezakirin. Necdet Menzîr wiha got: **"Ew kesê ku li ser navê hembajariyê sûcdaran di mala xwe de vedişêre, bila dev ji vê yekê berde. Heke na, sibehê wê ew jî bi sûçdaran re hesab bidin."**


Hayrî Kozakçioğlu


Necdet Menzîr

Ev gotin di 12'ê mehê de, li Walîtiya Stenbolê di gel Walî Kozakçioğlu hatin diyarkirin. Ev daxuyaniya Menzîr gelek tûj hate dîtin û zehf kesî jî bertekiya (reaksiyona) xwe dan nîşan, ku wê di rojê pêş de înfazên bêdaraz li ser Kurdan werin pêkanîn. Dibêjin ku êdî Menzîr û Kozakçioğlu nîheyeta xwe bi eşkere derxistine der.

Bal li ser axaftin û daxuyaniyên Menzîr ên berê jî tê kişandin ku, piştî bûyer û livbaziyên hêzên çepgir jî eynî tişt ji aliyê wî ve hatine gotin û kuştinên ji hêla polîsan ve, bêyî darizînê (mehkemekirinê) zêde bûne. Mudurê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzîr, di pey qewmînên ku ji hêla partî û rêxistinên çep ve çêdibûn ev daxuyan dida: **"Em terorîstan dizanin, cezayê ku wê hewce bike emê bidine wan. Heyf li erdê namîne."** Piştî gotin û xeberdanên bi vî tehrî, înfaz ji aliyê ekîbên ku girêdahiyê "Têkoşîna bi Terorê re" ne pêk dihatin.

Li Stenbolê ji Rezbera 1992'yan bi vir ve, di bin serokatiya Menzîr û Kozakçioğlu de 48 kes hatine kuştin, bêyî ku bêne girtin û mehkemekirin.

Piştî bûyera Tuzlayê ku ji aliyê Tîmên Tolhildanê yê Metropolan ên ARGK'ê ve, di 12'ê mehê de li Stenbolê pêk hat, beyanata Menzîr bi xwe re gelek endîşe û xetere jî anîn. Tê zanîn, di bûyerê de 5 serbazên (sûbayên) yêdek hatibûn kuştin û 30 kes jî birîndar bûbûn.

ARGK'ê bûyer hildabû ser xwe û diyar kiribû ku ev livbazî ji bo ku kirinên dewletê yên li Kurdistanê bi raya giştî bidine zanîn, kirine û mebesta wan misîleme ye.

Li dû axaftin û beyanên Necdet Menzîr di nava dû rojan de li navçe û taxên Kartal û Tuzlayê, ji 40 kesî bêhtir Kurd hatin binçavkirin. Di nav wan kesan de DEP'van jî cihekî giring distînin. Di hildanên binçaviyê yên polîsên girêdahî şaxa "Têkoşîna bi Terorê re" yên Emniyeta Stenbolê de, hemû zilamên malbata Öztürk hene.

Hayrî Kozakçioğlu beriya ku bibe Waliyê Stenbolê li Amedê wezîfeya Waliyê Rêveberiya Taybetî dikir û bi kirinên xwe yên xedar ve tê nasîn. Daxuyaniya wan î ku Kurdên Stenbolê wek hedef tê nîşan, ji aliyê Kurdan ve daxuyanek ne ji xêrê re hate nirxandin û bal kişandin ser wan ku herdu jî di xizmeta şerê taybetî de ne.

Di rojên pêşî de tê endîşekirin ku kuştinên bêdarazî, cerdên polîsan wê bêne zêdekirin û binçavîtî her here bêhtir bibe. Ji ber ku hemû Kurdên li metropolan dijîn êdî ji rejîmê re, tê gotin ku wek potansiyala sûcdaran tên dîtin.

## ROJEVA WELÊT

### Hûn dixwazin dasê li gûzika xwe bixin, fermo!

Kurd êdî ne bi tenê li Kurdistanê, li bajarên Tirkiyeyê wek potansiyeleke sûcdar têne dîtin. Bi diyarî gef li wan tê xwarin, hedef têne nîşandan. Gelo we qet ji xwe pirsiye ji bo çi, ji ber çi? Çima êdî bi dizî, bi veşarî na, lê bi eşkere tiliya xwe li ser Kurdên ku li metropolan dijîn jî, dihejînin? Em dikarin pirsên bi vî awayî zehf bipirsin, lê bersîva tevan yek e. Ev pirsgirêka han tengasiya ku dewlek tê de dijî, didin nîşan. Ev yek şanê tengasiyê, dînbûn, harbûn, hişavêtin û sewsîbûna rayedar û desthilatdarên Tirk e. Heke bal li daxuyaniyên Necdet menzîr bê kişandin wê were dîtin ku, psîkolojiya wî ne baş e. A din li rex xwe jî Waliyê Stenbolê Hayrî kozakçioğlu datîne. Kirinên wî yên di dema "Walîtiya Rêveberiya Herêma Taybetî" de hê jî li ser zarê gel e. Wisa dixuye ku li Stenbolê jî naxwaze bela xwe ji Kurdan veke.

Li Kurdistanê gava livbaziyeke gerîla li hember polîs, leşker, cerdevan û tîmên taybetî an jî sazî , sazgeh û avahiyên dewletê pêk tê, hemû gund, an jî bajar ji top, panzer û çekên giran ên dewletê re dibin armanc. Tên tarûmarkirin. Mirovên sivîl û dectevala têne gullebarankirenê. Cizîr, Şirnex, Çelê, Pasûr, Hênê, Vartinîk û Licê li ber çavan e. Ne hewceyî şîroveyê ye jî. Em dizanin ku li Edeneyê, Antalyayê û Mersînê jî cerd li ser malên Kurdan tê kirin. Girtin, talankirin, kuştin, pest her diçe diqewimin. Bi gotineke din, Kurdên ku ji ber şerê qirêjî û pêkutiya dewletê malên xwe bar dikin, koçî bajarên Tirkiyeyê dibin, disa ji pêstûriya hêzên dewletê nafilitin. Di deh salên dawî de tê gotin ku, nezikî 7–8 milyon kes koçî metropolan bûne. Tev wek pêgirê "PKK'ê tên qebûkirin. Li Edenê bi 30 hezaran kes digîjin hev û bi sloganên wek, "PKK gel e, gel jî em in" bang dikin, xwepêşandanan li dar dixin.

Ev encam derdikeve holê, bi valakirina gund û bajarên Kurdistanê, bi koçkirina gel, gelş û gelemeşe hel nabin. Gel siyasî bûye, ango êdî li Kurdistanê siyasat civakî bûye. Herine ku rewşa wan bi wan re ye. Bi valakirina Kurdistanê dewlet nikare ji gelşê biseqire. Metropol jî ji bo Kurdan êdî cihê livbazî, têkoşîn û xwepêşandanan e. Vêca em werin ser gefên Menzîr. Wisa dixuye ku rojên pêşiya me ji bo înfazan tê hazirkirin. Rojnamevan jî wek rayedarên dewletê difikirin, balê dikişînin ser Kurdên metropolan. Li wan bi guman dinihêrên, rê nîşanî polîsan didin. Di şerê psîkolojîik de cihê xwe distînin. Yek ji wan Editorê Turkish Daily Newsê Îlnur Çevîk e. Ew ji Kurdan hedef dide nîşan.

Divê bê gotin ku mînak û aqûbeta Beyrûdê li ber çavan e. Kî dixwaze şerê hundirîn derkeve, talan û tajan bibe? Kî dixwaze canê wî biêşe, pihîn li nan û hêlîna wî bikeve? Heke dixwazin ji bo qewimîna wî tiştî bixebitin, fermo. Bila bi nixava destê xwe agirê şerê hûndirîn geş bikin. Eger Stenbolê jî, dixwazin wek bajarên Kurdistanê xera bikin, bila kêliyekê jî nesekinin û dest bi kuştinan bikin. Daxuyanî û gotinên wek yên Menzîr ne şanê xêrê ne. Bila bê zanîn ne ji Kurdan re, ji hemû rûniştvanên Stenbolê re talûke li ber derî ye. Gelo wê vê carê kurdan koçî ku bikin? Divê ev jî neyê jibîrkirin, sirke çiqas ar be denê xwe diderizîne.

# Hêzên dewletê Silopî rûxandin

**Navenda Nûçeyan–** Gerîlayên ARGK'ê di şeva 11'ê Reşemiya 1994'an de êrîş birin ser navçeya Silopiyê ku li ser Şirnexê ye. Êrîşa gerîlayên ARGK'ê, bi taybetî li ser Muduriya Emniyetê ku nû hatibû avakirin, bû. Di vê êrîşê de Emniyet û hin avahiyên dewletê gelek xesar dîtin û 8 polîs, 5 tîmên taybetî û 3 gerîla jî mirin.

Piştî êrîşa gerîlayan, hêzên dewletê ji mal û karistanan bi sedan mirov girtin binçav û ji nav wan jî 14 kes hilbijartin û birin dûrî navçeyê û li wir kuştin. Agahiya ku ji aliyê leşkerekî ve hate dayîn, ev 14 kes, berê ji her alîkariya bi PKK'ê re hatibûn binçavkirin û dû re jî hatibûn berdan.

Ji xeynî vê, hêzên dewletê, piştî ku gerîla ji navçeyê derketin, bi saetan navçe dane ber gullebaranê. Di vê gullebaranê de, bi sedan mal û karistan hatin rûxandin û 3 otobusê rêwiyan jî hatin şewitandin. Ji 12'ê Reşemiya 1994'an pê ve jî, li Silopiyê derketina derve, ji aliyê hêzên dewletê ve hate qedexekirin.

Agahiyên ku ji çavkaniyên herêmî hatine standin, ev e. Gerîla di 11'ê Reşemiyê, dora saet 19.30'an de, Muduriya Emniyetê, ku li taxa Yeşiltepe ye, êrîş birin ser. Li wir teqîniyeke gelek mezin çêbû. Dû re li her derê Silopî warên pozberî qewimîn. Qederê 2 saetan êrîşa gerîlayan dewam kir. Piştî saeteke din jî, hêzên dewletê navçe dane ber gulleyan. Bi sedan kes hatin binçavkirin û ji wan 14 kes jî hatin kuştin. Lê di gullebarandina hêzên dewletê de, 2 zarok û jinek jî mirin. Ji 12'ê Reşemiyê pê ve jî qedexekirina derketina derve dest pê kir.

Nûçeyên ku Kurd–A li ser vê bûyerê weşandiye, bi kurtasî ev bû: "Di roja pozberiyê de, gerîlayan panzerek îmha kirine û gelek xesar dane avahiyên dewletê. Bi sedan xanî û karistan jî, ji aliyê hêzên dewletê ve hatine rûxandin û zêdeyê çardeh kesan mirov jî hatine kuştin."

Ji xeynî vê di 13'ê Reşemiyê de, di dema qedexekirina derketina derve de, hêzên dewletê dîsa li ser navçeyê bombe barandin. Di vê bombebarandinê de jî, Îbrahîm Şeflîk (5) mir, bi navê Hanim Şeflîk, Mehmet Şeflîk, Sorê Şeflîk sê zarok birîndar bûn.

Li ser vê bûyerê, malbata zarokan agahiyeke wiha dan: "Hêzên dewletê, her roj bombe diavêjin ser navçeyê û qet nabêjin zarok, jin, kal û pîr, dikujin. Di dema bûyerê de navçeya me dîsa dane ber gullebaranê. Ji nişka ve teqîniyeke mezin ji derve hat. Me lê nêrî ku, her 4 zarokê me jî, li erdê ne.

Jixwe Îbrahîm di cih de miribû. Zarokên birîndar jî me rakir Nexweşxaneya Fakulteya Tipê ya Diyarbekirê. Rewşa Sorê pirr xedar bû, lê niha talûkeyê derbas kir. Leşker bombe avêtin ser zarokan. Piştî ku bombe avêtin wê jî, qet eleqeya xwe neanîn. Çi sûcên zarokên 5–6 salî heye? Niha jî doxtorên nexweşxaneyê dibêjin, hûn pere nedin, rahijin zarokên xwe herin. Di wan de qet wijdan tune? Em niha heyîrîne ku em çi bikin?"

## ..........NÛÇEYÊN CENGÊ..........

# Dewlet êrîşên qirêjî didomîne

■ Di vê hefteyê de hejmara kesên ku li Kurdistanê di şer de mirine ev in: 28 leşker, 5 polîs (tîmên taybetî), 2 cerdevan, 7 gerîla û 32 kesên sivîl. Ji bilî van 19 tîmên taybetî û 10 kesên sivîl jî birîndar bûn. Li gorî nêrîna dewletê, serê her leşkerekî kuştî divê kesek (heke ku gerîlayek neyê kuştin) bête kuştin. Bi pirranî jî ev kesên ku tê kuştin (ji aliyê dewletê ve) gundî ne. Wek mînak li Silopî bi êrîşa gerîlayan re gelek polîs û leşker hatin kuştin, lê mixabin hêzên dewletê heyfa (!) xwe bi kuştina 14 kesên sivîl hilanîn û ew wek gerîla dan xuyakirin.

**Navenda Nûçeyan- 9 Reşemî 1994-** Li Amedê kesên nenas xebatkarê sendîkaya Tes-îşê Mehmet Şîrîn Akboğa kuşt. Hezar kes beşdarî cenazeyê Akboğa bû û kirinên kiryar nediyar protesto kirin.

Gundiyên gundê Dihê (Erûhê) Salpan, ji ber pesta dewletê malê xwe hiştin û ji gund koç kirin. Serbazê leşkerî Hüseyîn Kurt, ji bo gundî gund vala bikin, 7 roj mudet dabûn wan, lê berî ev wext biqede gundiyan bar kir.

Li Nisêbînê hêzên dewletê derketina kolanan qedexe kirin. Ev biryar li ser êrîşa gerîla pêk hat. Di vê êrîşê de leşkerek hatibû kuştin.

Li gundê Pazarcikê bi dehan gundî ji aliyê hêzên dewletê ve tên binçavkirin. Ji mezraya Kendîrlerê ya ku li ser gundê Tilkîlerê ye, Îbrahîm Kolûman û ji gundê Maksûtûşaği mamosta kursa nexşan Zeynep Ûraz hatin binçavkirin.

Li Amedê kesên nenas li hemberî Lîseya Bîrlîkê, bi molotof kokteylan êrêşek anîn pê.

**10 Reşemî 1994-** Gerîlayên ARGK'ê pira Nêrdiza ku di navbera Cizîrê û Silopî de ye, ruxandin. Gerîlayên ARGK'ê li Şirnaxê girtin ser kanên komirê. Di sergirtinê de, şer di navbera leşkeran û gerîlayan de derket, karkerek hate kuştin û yek jî birîndar bû.

Hêzên dewletê girtin ser gundê Bacaliyê yê ku li ser Dîgorê ye, 28 gundî binçavkirin. Piştî binçavkirin û lêdanê, gundiyên Bacaliyê heta Dîgorê meşiyan û kirinên dewletê protesto kirin.

Li Dihê mezraya Koxa ku li ser gundê Eynçîrkêyê vala bû. Hêzên dewletê mudetek ji bo valakirinê dabû vê mezrayê jî.

Li Dîgorê 22 gundî, ku di operasyonên dewletê yê li hemberî gundan de hatibûn binçavkirin, ji aliyê dadgeha Dîgorê ve hatin girtin û ketin girtîgeha Erzîromê.

Kesên nenas li Amedê mutahîdek bi navê Ahmet Karaman kuşt.

**11 Reşemî 1994-** Li Amedê û li Nisêbînê di êrîşên kesên nenas de, yek mir û 2 kes jî birîndar bûn. Di êrîşên Amedê de Alî Doğrû mir û Kasim Işik jî birîndar bû. Li Nisêbînê jî Hüseyîn Yildiz birîndar bû.

Midûrê Îtfayeya Amedê Adem Fırık, ji aliyê polîsên têkoşîna bi terorê ve hate binçavkirin.

Serokê belediya Dirbêsiyê (Şenyûrt) M. Mahsûn Ağaoğlû, ji aliyê tîmên taybetî ve hate binçavkirin. Ağaoğlû endamê Partiya Demokrasiyê û berendamê serokatiya belediyeyê ye jî.

Polîsên emniyeta Bidlîsê, girtin ser mala birayê serokê Partiya Demokrasî yê Bidlîsê Îshak Tepe, Ramazan Tepe. Di sergirtinê de polîsan agir bi malê xistin û lawê Ramazan, Sanî Tepe jî binçavkirin.

Hêzên leşkerî girtin ser gundê Ersê (Gedîkyaşar), ku li ser Dihê ye. Hêzên leşkerî doza cerdevaniyê li gundiyan dikin, lê gundî vê yekê qebûl nakin.

Gundê Dîgorê Bacalî, di bin ablûkaya hêzên leşkerî de ye. Rojek berê 28 kes ji aliyê leşkeran ve hatibûn binçavkirin û li ser vê yekê gundiyên Bacalî heta Dîgorê meşiyabûn û kirinên dewletê protesto kiribûn.

**12 Reşemî 1994-** Li Stenbolê di îstesyona trênê de bombe teqiya, 5 serbazên yedek mirin û 30 kes jî birîndar bûn. ARGK li bûyerê bxwedî derket.

Li hêla din, di êrîşên gerîlayên ARGK'ê yên Şirnex, Silopî û Dêrsimê de 28 leşker û 13 polîs hatin kuştin. Di van êrîşan de 5 gerîla û 14 gundî (piştî êrîşa gerîla li Silopî ji aliyê leşkeran ve hatin gullebarankirin) mirin.

Li Xanê (Hanî) hêzên dewletê 4 roj li ser hev bajar dan ber gulleyan. Ev êrîşên dewletê bi hatina mensûbên Artêşa Taybetî ve destpê kir. Di gullebarankirinê de gelek xanî û dikan xesar dîtin.

Mînîbûsek li gundê Bismilê Koğûk, li mayinê qelibî, 4 kes mirin û 8 kes jî birîndar bûn.

Hêzên leşkerî girtin ser gundê Dîgorê Kocaköy û Bostankale, 55 gundî hatin binçavkirin. Di sergirtina gundan de leşkeran ala Partiya Demokrasiyê wek sebebê binçavkirinê rêdane.

Li gundê Încesûyê ku li ser Tûlûcayê ye, hêzên dewletê 4 kes bin çav kirin. Li Bazîdê jî hêzên dewletê gelek kes bin çav kirin, ên ku navê wan diyare ev in: Mehmet û Gülten Tozbey.

Gundên Pazarcika Mereşê, ji aliyê dewletê ve tên valakirin. Gundê Tîlkîler û Cimikanli û gundên elewiyan ku ne cerdevan in, dibin hedefa hêzên dewletê.

Endamê Eğît-Senê mamoste Celal Sabak ji aliyê polîsên emniyeta Amedê ve, li taxa Bağlara hate binçavkirin.

**13 Reşemî 1994-** gerîlayên ARGK'ê li wêranşarê notirvan (bekçî) Mehmet Yilmaz (49) û muxtar Şevket Dîrek (45) kuştin. Li Şirnexê jî gerîlayan muxtarê gundê Deşta Mela (Kirkköy) kuşt.

Di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de li gundê Dîgorê Bucaliyê 2 gerîla û li gundê Hazro Şimşînê jî gerîlayek (ji aliyê cerdevana) ve hat kuştin. Di van êrîşan de 2 cerdevan hatin kuştin û gelek leşker jî birîndar bûn.

Li Amedê di êrîşa kesên nenas de Cavît Bîçkîn, hate kuştin. Ji hêla din H. Murat Îmren, ku çend roj berê ji aliyê kesên nenas ve hatibû birîndarkirin, di nexweşxaneyê de mir.

Leşkeran, şivanê gundê Girdarayê ku li ser Dihê ye (Ormanardi) Alî Güneş kuşt û di televizyonan de ew wek "terorîst" hate rêdan.

Hêzên dewletê li gundê Bidlîsê Tatikê (Yolalan) û Kelhokê (Boztepe) 40 kes (jin û zarok jî di nav de) binçavkirin. Li navçeya Tuxê (Tatvanê) berendamê SHP'ê Ahmet Engîn jî di nav de, 36 kes ji aliye hêzên dewletê ve hatin binçavkirin.

Hêzên dewletê girtin ser gundê Farqînê Mîralî (Alîbey) yê, Hezo (Kozlûk), Apika û Hacoyê û li Nihiyayê Sêrtê Gökçebağê, di 9 kes binçavkirin.

**14 Reşemî 1994-** Li Cizîrê du panzerên ku li hev qelibîn, yek jê di çemê Dîcleyê de winda bû, 5 tîmên taybetî mirin, 6 tîmên taybetî jî birîndar bûn. Piştî vê bûyerê hêzên dewletê taxa ku nêzî bûyerê bû, dan ber gulleyan, xebatkarê Karayollari Rêyan Abdullah Uysal hate kuştin.

Li Amedê û Êlihê (Batmanê) kesên nenas du kes kuştin. Di êrîşa Amedê de Cavît Bîçkîn û di ya Mihê de jî Ramazan Meral bûn hedef.

Ji 12 Reşemiyê û bi vir de hêzên dewletê li Silopiyê digirin ser malan û ta niha bi dehan kes hatine binçavkirin. Piştî êrîşa gerîlayan, hêzên dewletê li ser gel, (ji kuştinê ta xeserê) zilmê didomînin.

Nûnerê kovâra Özgür Halkê yê Amedê hate binçavkirin.

Hêzên dewletê li hemberî 26 gundên Tutaxê çavsoriyan dike. Bi vê hewldana dewletê 4 gund (Bayindir, Mulluşemdîr, Yenîköy û Sîncalî) ji mecbûrî dest bi cerdevaniyê kirin. Ji bilî van gelek gundî, malên xwe dibin Dutaxê.

**15 Reşemî 1994-** Li Hîzanê û Cizîrê cendekê du kesan hate dîtin. Ji van kesan yek jê ji gundê Vankê bû ku li ser Hîzanê ye. Cemîle Şanik di 10'ê Reşemiyê de ji aliyê tîmên taybetî ve hatibû binçavkirin û piştî binçavkirinê bi sê rojan cendekê wê bê serî hate dîtin. Cendekê din jî li Cezîrê yê karmend Abdullah Yilmaz bû.

Hêzên dewletê gundê navçeya Çağlayanê Cerîta Mereşê, mezraya Kelhuka Duzbaxê û zozanê Evren û xaniyên li çiyayên Nurhakê şewitandin. Ji hêla din, gundê Hasan Alî ku li ser Elbîstanê ye û mezraya Renûk jî ji aliyê tîmên taybetî ve hatin şewitandin.

Hêzên dewletê girtin ser gundê navçeya Pazarcika Mereşê Maksûtûşaği, 4 kes binçavkirin.

Li Nehiya Sêrtê li Gökçebağê jî Emîn Evîn (xebatkarê febrîkaya çîmentoyê) ji aliyê hêzên leşkerî ve hate binçavkirin.

Hêzên dewletê li Dêrikê derketina kolana qedexe kir û 2 hezar mêr (zilam) li qada Koçe civandin û yek bi yek fîlmê wan bi kamerayê kişandin (ew bi fîş kirin).

Muxabirê rojnameya Özgür Gündemê yê Rihayê Ramazan Ocalan, ji aliyê dadgeha Rihayê ve hate girtin û kete girtîgehê.

---

# NÊRÎNEK

**Îbrahîm Xort**

## Zimanê Kurdî û Kurdîtî

Ev çend hejmarên Welat in ku li ser vê mijarê radiweste. Hêja ye ku mirov hîn bêhtir jî li ser raweste, ji ber ku li ser vê mijarê çiqas bê rawestin dîsa ne bes e. Ji ber ku ziman hebûna bingeha gelan e. Gelên ku zimanê xwe winda kiribin di demek pirr kin de ew jî winda dibin.

Di dîroka gelan de tiştên ku li ser têkoşîn pirr hatiye kirin ziman e. Di şerê talan û wêrankirinê di şerê têkoşîna çandê û hwd. de, ziman li pêşiya hemû babetan e. Ji ber ku gel jî dizane ku, ziman ji dest here, wê zû winda bibe û êrîşker jî dizanin ku, gelê di binê bandora êrîşên wan de bin, ku zimanê wan neguherin, nikarin wan bi rehetî di binê bandor û nîrên xwe de bihêlin. Ji ber vê yekê, çawa ku di têkoşîna gelan de ji aliyên aborî û leşkerî ve şerên dijwar çêbûne, şerên çandê û zimên jî çêbûne.

Ev şerê hanê di dîrokê de her dem bi rengekî din derketiye hemberî gelan, carina li ser navê olperestiyê (dîndariyê), carina li ser navê hemdemiyê û carina jî, li ser navê navneteweyîtiyê! Sedemên van êrîşan çi dibin bila bibin, başî tê de tune, xerabî û windakirina gel û çanda gelan tê de heye.

Îro li cîhanê pirr netewe hene ku zimanê xwe ji bîr kirine û zimanê wan î fermî, zimanê dagirkerên wan e (Em vê rastiyê hîn bêhtir li erdnîgariya Efrîkayê dibînin– li wir, li ser navê xwedê! zimanê wan guhertine, ev guhertin jî, ne bi xwesteka wan gelane, bi qirkirinên dagirkeran çêbûne). Karaktera dagirkeran li her deverê wek hev e. Ji ber ku armanca wan yek e. Dagirker hemû ji tecrubeyên hev dersan derdixînin. Li kîjan welatî serhildana gel hebe, dewletekî dagirkerê din, tê tecrubeyên xwe, ji dewleta dagirker re dibêje, da ku wê serhildanê berevajî bike.

Li welatê me jî, îro ev rastî heye. Dewlet êrîşî her nirxê Kurdîtiyê dike, êrîşî zimanê me dike û dixwaze winda bike. Nikaribe winda bike jî, mêjiyan girîkî (şîlo) dike.

Ger em hebekî çavên xwe vekin, ev rastî weke mirekê (neynik) li hemberî me ye. Rojname, kovar û pirtûkên ku bi Kurdî derdikevin hîn li devê çaxaneyan, xwe di binê potînên dagirkeran de dibînin! Xwediyê wan yan têne girtin, yan jî di binê çembera aborî û dadgehên wan de nikarin bêhna xwe bistînin. Jixwe, ji vê em nikarin gazinan bikin. Neyar e. "Neyartî bê minetî ye". Gazina me, ji me ye.

Di dîroka xwe de me serhildanek wilo bi coş nedîtiye! Li her deverê û di her warî de serhildan! Ji bilî ziman. Çima em zimanê xwe diavêjin aliyekî, lê xwedî dernakevin? Bi milyonan Kurd alîgirên vê têkoşînê ne, lê em li weşanên Kurdî dinêrin, kêm tên xwendin Ev rewş, têkoşîn û Kurdîtî, çi ji hevdu re dibêjin? Yan me ji armanca vê têkoşînê baş fêm nekiriye, yan jî me qîma xwe di pêşerojê de bi zimanê Tirkî aniye. Ev sedemên ku li jor me hejmartin, hemû ji bo me divê berevajî bin. Ji ber ku têkoşîna neteweyekî, têkoşîna ziman e jî. Ziman, Kurdîtî, têkoşîn ku bi hev re bimeşe dibe xwedî wateyeke girîng. Ne wisa be ji aliyekî xwe ve seqet e! Ger em nexwazin ku pêşeroja me seqet be divê li îro ve em pêşiya wê bigirin.

### *Bi xameyê Sîrwan Reşît helbestvanekî Kurd î sosyalîst: Qanî*

# 'Girtin û kuştin bergîdana azadiyê ye'

*Bira bin, bila armanc yek be, biratî yekbûna*
*armancê ye.*
*Evê ku alîkariya fikirî bi we re dike,*
*Li ku dibe bila bibe birayê we ye.*

Dema mirov behsa helbestvanekî wek Qanî dike, pirr tişt tên bîra mirov, wek: Zehmetkeşî, têkoşerî, qeraşî, sosyalîstî û hwd. Qanî piştî çardeh keçikan, wek lawê yekemîn ji dayika xwe bû. Hîn ku Qanî di zikê dayika xwe de bû, bavê wî mir û piştî 40 rojiya xwe dayika wî jî mir. Sêwiyekî ku di 1898'an de li deşta Şarezorê bê dinê, wê çawa mezin bibe û wê kî lê xwedî derkeve? Ev bi xwe, wek me berê jî gotibû, li devera Şarezorê, li başûrê Kurdistanê hatiye dinê, lê zarokatiya xwe bi pirranî li rojhilatê Kurdistanê, li bajarê Merîvanê derbas kiriye.

Rojekê, Qanî di nav zarokên Merîvanê de dileyîst, peyayekî xanedanê Merîvan, ku bi rewşa wî dizanibû, li wî xwedî derket û wek lawê xwe li Qanî nihêrî.

Pişt re Qaniyê helbestvan, bi vî awayî qala wî pêyayî (Seyîdî Corî) dike:
*Hezar rehmet le giyanî pak î Seyîdî Corî.*
*Ke mindal bûm be destî xoy mesarî jînî mî gorî.*

Heke mirov vê helbestê wergerîne Kurmancî wiha ye:
*Hezar rehmet li giyana pak, a Seyîdê Corî*
*Ku ez zarok bûm, bi destê wî riya jiyana min guherî.*

Qanî di jiyana xwe de, li medreseyê xwendiye, bûye feqe û pişt re li gelek deverên Başûr û Rojhilat meletî kiriye, lê belê zehfê jiyana xwe, bi zehmetî, dijwarî û xizanî derbas kiriye. Bi pirranî jî karê aşvaniyê kiriye. Her çiqas dijwarî û zehmetî kişandibe jî, jiyana xwe bi rûmetî û serbilindî derbas kiriye. Li ser aşvaniya xwe, di helbestekê de wiha dibêje:

**Soranî**
*Le tozî aşa da xark im, le fewqî ser, heta ejnom.*
*Belam çend xoşe ew toza ke her xom amîr im,*
*bo xom.*
*Ne tirsî emrî mefewiqûne mehkûmî beratî xom*
*Le sayêy zehmetî hezî dest û qaç û ser û estom*
*Le bo kes çaw le ber nîmo, xeyalî rêy riya nakim.*

**Kurmancî**
*Di nav toza êş de winda bûme, serdanpê,*
*Lê çiqas xweş e, ev toz ku her tim amîr im*
*bo xwe.*
*Ne tirsa fermana serdestan û ne mehkûmê*
*berata te me*
*Ji saya zehmetê hêza dest û ling û ser û*
*hestiyê min*
*Çavê min ne li destê kesî ye, xeyala riyakariyê*
*nakim.*

Qanî helbestvanekî şoreşger bû û bîr û baweriyên sosyalîstî diparastin. Wî wek rênîşandareke jênager bi vê bîrdozê girtibû.

Bi helbestên xwe ev bîr û baweriyên sosyalîst radigihandin karker û cotkarên li dora xwe.

Helbestên Qanî, tim û tim li ser zimanê hejarên Kurdistanê ye. Qanî bîr û baweriyên xwe yên sosyalîstî wiha derdibirîne û dibêje:

**Soranî**
*Ba du qat nebê xanu û seraket,*
*Parey qatêkiyan bide be biraket.*

**Kurmancî**
*Bila ne du qat be xanû û koşka te*
*Pereyê qatekî bide birayê xwe*

Her wiha di helbesteke din de, bi awayekî xurttir û çaktir dibêje:

**Soranî**
*Ba hemû cotyar û pale û rêncberan*
*Yekgirin ta debine hêz û piştîwan*
*Hilgirin yekser dirûşmî hewbeşî*
*Bê ciyawazî le ser remîz û nîşan*
*Komalî sosyalîzm binyan binên*
*Tawa ku bibne nimûne bo cîhan*
*Keltekênin em nîzama bogene*
*Da birêsin koşkî yek sanî jiyan.*

**Kurmancî**
*Bila hemû cotyar û pale û rêncber*
*Hilgirin yekser dirûşma hevbeşiyê*
*Bêyî cudatî li ser remîz û nîşan*
*Civaka sosyalîst ava bikin*
*Heta ku hûn bibin mînak bo cihanê*
*Hilweşînin vê pergala genî*
*Da ku lê bikin koşka yeksaniya jiyan*

Qanî ji ber bîr û baweriya xwe ya şoreşgerî û sosyalîstî gelek zehmetî kişand û fedarî kir. Li pirr deveran, dilê wî hate şikandin û ewqas ku pirr caran digihîşte radeya qewitandinê. Lê belê, wî her tim heta mirinê dev ji bîr û baweriyên xwe berneda, bû mêvanê gelek zîndanên Îran û Iraqê. Helbesta (di girtîgehê de) li Zîndana Qecer, li paytexta Îranê û li bajarê Tahranê nevîsandiye, (ku di gel lawê wî Wrya, li wir girtî bûn). Bêguman li vê zîndanê Qanî bi gelek zehmet û janan re rû bi rû dibû û nexweşiyên xedar û rojên reş derbas dikirin. Lê belê, ew bi xwe wisa qala vê zîndanê dike:

> *Qanî di gel ku, helbestvanekî şoreşger û welatparêz bû, pirr hez li qiseyên nisteq (vecîze) dikir. Di vî warî de gelek serpêhatî û yadên xweş yên wî hene. Wek mînak, piştî ku di gelek, karan de zirarê dike, nikare bibe serî, dikana kumfirotinê vedike. Der heqê vê yekê de wiha dibêje: "Heke Xwedê bizanibe ku min dikana kumfirotinê vekiriye, êdî wê mirovan bêserî biafirîne."*

**Soranî**
*Axîrîn malî jiyanim kuncî nebdî xane ye*
*Em kelepçe merhemî zomî dilî dêwane ye*
*Zor demêke, çawerwanî zir zirey zincîr dekim*
*Seyrî em zîncîrekem wek zêwerî şahane ye*
*Bûkî azadim ewê xwênim xenes bo dest û pê*
*Helqe helqey pêwenim, bo pil pilew lerzane ye*
*Gerçî dujmin wa dezanî min bi dîlî lal debim*
*Baş bizanî kuncî zîndanim qutabixane ye*
*Bîr î azadîm le zîndana firawantir ebê*
*Qurbeser ew dujminey hîway be bendîxane ye*
*Top û çestîr û kelepçe lam wekû efsane ye*
*Çawerwanî şoreşê kim alemê rizgar bike*
*Mîletim bo ew mabeste kirdewey şêrane ye*
*Çekî şorişgerî min, nûşîn û bîr û bawer e*
*Raperîn e, helmet e, pirr naretey Kurdane ye*
*Ger bi azadî ne jîm, mirdin telate bo leşim*
*Nokerî û serdeniwandin karî namerdane ye*
*Qanî em emro le zîndana be azadî dejim*
*Sedhezar nahlet le wey wa nokerî bêganeye*

**Kurmancî**
*Mala min a dawîn quncê bendîxaneyê ye.*
*Ev kelepçe dermanê birîna dilê dîwane ye.*
*Demeke dirêj e, çav li riya zirzîreya zîncîran e*
*Binêrin van zîncîran, wek zêwera şahane ye*
*Bûka azadiyê dixwazim, xwîna min bila hine be,*
*bo dest û piyê wê*
*Helqe bi helqe pêwena min, bi pilpile û*
*lerzane ye.*
*Gerçî dijmin wisa dizane ku, ez bi dilî lal dibim*
*Bila baş bizanibe ku, quncê zîndanê*
*kêtebxane ye.*
*Bîra azadiya min li zîdanan berfirehtir dibe*
*Xwelî li serî wî dijminî be ku, hêviya wî*
*bendixane ye*
*Girtin û lêdan û kuştin bergîdana azadiyê ye*
*Top û şestîr û kelepçe li ba min wek efsanê ye*
*Çavliriya şoreşekê me, ku alemê rizgar bike.*
*Gelê min ji bo vê mebestê xebatek şerane dike.*
*Çeka şoreşgeriya min, nivîsîn û bîr û bawerî ye*
*Raperîn e, helmet e, pirr nareteke Kurdane ye*
*Ger azad nejîm, mirin xelat e bo laşê min*
*Nokerî û serîdanîn karê namerdane ye.*
*Qanî me îro li zîndanê bi azadî dijîm*
*Sed hezar nalet li we be, yên ku nokerê*
*bêgane ne.*

**QANÎ Û QISEYÊN NISTEQ**

Qanî di gel ku, helbestvanekî şoreşger û welatparêz bû, pirr hez li qiseyên nisteq (vecîze) dikir. Di vî warî de gelek serpêhatî û yadên xweş yên wî hene. Wek mînak, piştî ku di gelek karan de zirarê dike, nikare bibe serî, dikana kumfirotinê vedike. Der heqê vê yekê de wiha dibêje: "Heke Xwedê bizanibe ku min dikana kumfirotinê vekiriye, êdî wê mirovan bêserî biafirîne."

Bêguman em nikarin li vir hemû serpêhatî û qiseyên nisteq yên Qanî binivîsin. Em du heban ji wan gotinan li jêr rêz dikin; Qanî carekê di gel axayekî dama dileyîze, axa dixwaze heqaretê li Qanî bike, dibêje: "Qanî vî kevirî bixwe." Qanî ji vê gotinê aciz dibe lê belê, zû bi zû heqê vê gotinê jî distîne. Rojekê dîsa dama dilîzin, Qanî bişkul datîne, jê re dibêje: "Axa ji kerema xwe re vê bişkulê bixwe." Axa jî nikare tiştekî bike û bi ber xwe dikeve, bêgav dimîne ku bişkulê bixwe!!

Dîsa Qanî di dema qeraşiyê de, dixwaze derdora aş paqij bibe û tu tevlîhevî çênebe, li derdora êş jî pirr dartûyên mezin hene, li ser darekê dinivîse, "cihê rûniştinê." Li ser dartûyeke din dinivîse "cihê beraşxistinê" û li ser yeke din jî dinivîse "cihê wilaq û kerê" û hwd. komek axa û peyayên wan ji nêçirvaniyê tên, riya wan bi vê deverê dikeve, dixwazin hinek pûşî (bêhnvedan) bidin. Lê belê bêyî ku bala xwe bidin nivîsan, diçin li bin dara ku li ser nivîsa "cihê wilaq û keran" nivîsiye, rûdinin. Qanî jî li wan dinêre, dikene û henekan pê dike û dibêje: "Ocaxzadeno ew cihê we nîn e. Ji kerema xwe re werin bin dara din. Ew jî dema li nivîsê dinêrin, şermazar dibin û diçin bin dara din.

Tiştê em bibêjin Qanî hem helbestvanekî xoşewist î gel û hejaran bû û hem jî nivîskarê van pirtûkên ku em dê li jêr navê wan bidin, bû.

**1- Gulaley Merîwan**
**2- Baxçey Kurdistan**
**3- Awarboxî Pêncwên,**
**4- Şaxî Hewraman**
**5- Deştî Germiyan**
**6-Dîwana helbestên wî, ku dîwaneke mezin e.**

Qanî di sala 1965'an de diçe ser dilovaniya xwe û dîwana helbesta wî ji aliyê kurê wî Burhan Qanî ve ku ew jî yek ji rewşenbîrên navdar ên Kurdan bû, hate weşandin.

***Werger: Sîrwan Reşît - S. Berbang***

# Bêhna laşê lawiran kete nav bêhna giya

**EBDULHELÎM YÛSIV**

*Bêhn li çar hêlan belav bû*
*Bêhneke biyanî*
*Bêhneke dijwar*
*Dîwarên pirsan li her alî*
*bilind bûn.*

Hinek dipişkiyan, gêj dibûn; hinek ditirsiyan, çokên wan dilerizîn; xwîna hinekan dikeliya, kef bi devê hinekan diket. Şûr simbêlê hinekan nedibirî, êş diket hestiyan. Gelek serî ketin girînokê, gelek dilan bi destê hevdu girtin û govend gerandin. Gelek cendek û laş ji tirsan re ji jor ve hatin xwar. Dinya li hev ket, kevir bariyan. Bi hezaran çav vebûn. Ax dişewitî, ezman devê xwe bi deh gazan ji hev vedikir. Gelo çi bûye? Kî dizane ev bêhna ku roj bi roj xurt dibe bêhna çi ye? Bû hewar hewara generalan. Artêş li nav hev ketin. Bêhna erdê gelek paytextan hejand. Dewletan kir qide qid, bi sedan kûçik civandin, li şûna bêhnê geriyan. Bajar bi bajar, gund bi gund. Bi sedan xelkên perîşan hatin kuştin.

Balefir, tanq, top, bombe û çekên nutronî tev amade bûn li dijî vê bêhnê. Li gelek cihan cokên xwînê herikîn, heta ku gihîştin şûna vê bêhnê. Bêhn ji çiyayekî bilind difûriya, li erd û ezman belav bû:

*Canê canê canê*
*Were meydanê*
*Dilê min pirr xweş e*
*Bi vê dîlanê*

Serokên artêş û dewletan bi serê xwe ketin, jinên wan porê xwe kişandin:

– Divê ev çiya ji kokê ve bê hilanîn.

Divê ev bêhn tune bibe di çend rojan de. Parlamenter, hozan, konevan, zana, serok, leşker û xelkên wan tev de bûn yekdest, ji bo çareyekê ji vî çiyayê bêcir re bibînin. Ne dînamît, ne mayîn û bombe, ne jî tanq û balefiran sûde nekirin. Bêhn xurttir dibû. Her parçeyek ji çiyê diket, dibû giya û bêhn dida. Bêhneke ji bêhna misk û enberê xweştir bû bi xelkê çiyê:

*Kes û jin û pîr tev*
*Rabûn tev dest dan hev*
*Xort giş hatin bi rev*
*Ji bo dîlanê.*

Vê bêhnê di dilên wan de agir dada. Bi dehan, bi sedan xort û kesên wan bi xwîna canên xwe, ev giya av didan. Her kevirek ji wî çiyayî diket, deh kevir kom dibûn. Li aliyên din, dewlet ketin hev, bêhna xelkên wan, berî leşkerên wan diçikiyan. Xew li wan bû hesret. Nanê xwe berî ku bixwin, di destê wan de dibû textik. Ava xwe berî ku vexwin, li ber devê wan dibû herrî. Li ser zikreşî, çavsorî û kînê xwedî dibûn. Her yekî dixwest goştê laşê birayê wî xwarina wî be. Gotûbêj, danûstandin li dar bûn, ji bo tunebûn û qirkirina çiyê, dengê generalê mezin bilind bû:

– Sê rojan bêhna xwe li min fireh bikin. Roja çaran wê ev çiya tune bibe.

Kêfa wan hat, çek û hêzên dewletê tev li çiyê bûn yek. Bêhnê, leşkerên general li erdê dikirin term. Can ji laşên wan dikişand. Sê roj, deh roj, bîst roj û hîn bêhn difûre, bêhn wek dûmanê dihate der, ji qelîştek û kortên çiyê. Rojname, kovar, tijî bûn ji gotar û nêrînên li ser dîroka çêbûna çiyê û çawatiya rahiştina wî ji binî ve. Hin kes digotin:

– Bêhn şaşîtiyeke dîrokî ye.

Hinekan digot:

– Bêhn ji çêkirin û kedîkirina dewletên din e, nemaze Çîran.

Çîranan ev bêhn bi ser serê me de rakirin. Hinekên din ev giya çandin, xwîna xwe jî bi derewa li ser kirin. Ev giya şeytanî ye. Giyayekî nû, hema bi qontara çiyê ve şîn tê. Bi dehan pirtûk hatin çapkirin li ser vê pirsgirêkê. Bêhna vî çiyayî çawa wê raweste. Kuştina çiya, rahiştina wî, lê hîn bi vî çiyayî daketibûn. Qêrîn bi seroklêşker û berpirsiyarên wan ketin:

– Bêhn ji çiyayekî din jî tê.

Bêhnê ew xistin gerînokê. Giya li serê wan bû tevn, şerekî giran di navbera çiyan û hêzên dewletê de çêbû. Xwestin kevir li ser kevir nehêlin.

*Dîlan e şoreş e*
*Her kes pê serxweş e*
*Erd û ezman şîn bûn*
*Bi vê dîlanê.*

Wêneguhêzên dewletên din jî, ji xwe re bi wan dikeniyan. Şerê napalm, balefir, bombe û artêşeke mezin bi çiyan re, tîqe tîqê temaşekaran bû, li ber van wêneyên tevlihev. Çiya bûn bela serê dewletê. Xelkê çiyê jî, ji hev re digotin:

– Wey sed xwelî li serê çiyê be, ger bi van hesin mesinkan ji hev bela bibe, yan serê xwe daxe. Her kesî jî zanibû ku, çiya nikare xwe daqûl bike û sertewandin ne karê çiyê ye. Dewletê lawirên giyaxwir kom kirin. Ew birçî dikirin û berdidan hawirdora çiyan, giya tev de serqutkirî kirin, tak bi tenê dirêj nema, lê ew giya bû jehr û kete zikên van lawiran. Pê re pê re li erdê digevizîn. Te digot qey ne ji niha ve, lê ji berî heft salan ve mirîne. Bêhna laşê lawiran kete nav bêhna giya, wekî mijê bêhnên xweş û nexweş li serê çiyan kon vegirtin. Giya dîsa şîn hat:

*Dîlan gelek xweş bû*
*Delîl pê rûgeş bû*
*Dilê dijmin reş bû*
*Bi vê dîlanê.*

Dewleta şiyar nifşeke lawirên din anî. Ew jî çû, yekî din anî. Fabrîke (kargeh) vekirin ji bo çêkirina lawirên giyaxwir. Çi lawirê goştxwir jî hebûn ser jêdikirin di cih de. Eger lawiran erd ji giya paqij nekirin dewlet bi leşker û mirovên xwe diketin nav erdên kesk, giya bi dev û diranan û dest û lingan dixwarin û her bêhn jî, ji çiyê derdiket, giya jî pê re şîn dibû, bilind dibû.

Nas kirin ku bêhn û giya laşekî sax in, wek goşt û xwînê ne. Bêhn giya av dide, lê lawir nema di ber giya re digihan. Dibistanên taybetî vekirin ji mirovan re. Ew fêr dikirin, çawa giya bixwin li hember pere û xweşiyê. Bi hezaran mirov bi rola lawiran rabûn, hinek jî bûn lawir mejî û giya û kevir û ax û goşt û nan hwd... dixwastin. Nema li tiştekî dipirsîn. Çemên avê vexwarin, miçiqandin, berê xwe dane ezman, xwestin wî bixwin. Lawir ji mirovan pirrtir bûn, bêhn jî girantir dibû, giya bêhtir bela dibû:

*Ev bêhna çiya ye*
*Hawirdor giya ye*
*Wek bêhna bûka ye*
*Bêhna vê dîlanê.*

Dewlet bû dewleta lawiran, lawirên zer, şîn, sor, reş, giyaxwir, goştxwir, mirovxwir, baranxwir û xwedêxwir, lê bêhnê serî li wan gerandibû, ketibûn xeleqa windabûnê. Nemaze piştî ku kevirên çiyayê bi bêhn diranên wan hildiweşandin nav axê, polîs poşman vedigeriyan, ji hev dipirsîn:

– Gelo çawa emê vî çiyayî bixwin?!

Ne giya hişk bû, ne çiya herifîn, ne jî bêhn sekinî. Lawir ketin hev. Dewletê bi sedan kamyonên mişt diran ji dewletan kirrî. Bi çewalan diran kişandin dora çiyê. Her lawirekî xurcika xwe tijî diran kir û dest bi xwarina çiyan kirin. Kevir bi kevir.



Ji bo Wedat Aydin

*Wey sed xwelî*
*li serê çiyê be, ger*
*bi van hesin*
*mesinkan ji hev bela*
*bibe, yan serê xwe*
*daxe. Her kesî jî*
*zanibû ku, çiya nikare*
*xwe daqûl bike û*
*sertewandin*
*ne karê çiyê ye.*
*Dewletê lawirên*
*giyaxwir kom kirin.*
*Ew birçî dikirin û*
*berdidan hawirdora*
*çiyan, giya tev de*
*serqutkirî kirin,*
*tak bi tenê dirêj*
*nema, lê ew giya bû*
*jehr û kete zikên van*
*lawiran. Pê re pê re*
*li erdê digevizîn.*
*Te digot qey*
*ne ji niha ve, lê*
*ji berî heft salan ve*
*mirîne. Bêhna*
*laşê lawiran*
*kete nav bêhna giya,*
*wekî mijê bêhnên*
*xweş û nexweş*
*li serê çiyan*
*kon vegirtin.*
*Giya dîsa şîn hat:*
**Dîlan gelek xweş bû**
**Delîl pê rûgeş bû**
**Dilê dijmin reş bû**
**Bi vê dîlanê.**

## Stêrkek Kurd li esmanekî Erebî

# Selîm Berekat

"Ezê vî hesinî hilgirim
Li ser wî textê xurt
Yê di bin lingê min de
diheje
.....
Ezê sond bixwim
Ku ev hesinê hildayî
li ser destên min
Pêşerojeke şuştî ye
Di pişikeke Kurdî de!"

**Jan Dost**



S. Berekat helbestvan û romannivîsekî Kurd e, êşa miletê xwe bi zimanê Erebî dibêje. Ew stêrkeke Kurd e, li ezmanê toreya Erebî diçirise. Siwarekî Kurdan e, cirîda xwe li ser hespekî Erebî dike, gelek siwarên Ereban di nav toza simên hespê xwe de hiştine. Wî di destpêkê de çend pirtûk derxistin, van pirtûkan zû navdariyek fireh jê re çêkir.

Ji destpêkê rewşa miletê wî jê re xemek bû, ji gundê xwe Mûsêsana nêzîk Amûdê û Qamişlo, dest pê kir, vê dawiyê Kurdistan tev de jê re bû mijara nivîsandinê. Wî Kurdistan xistiye tûrikê xwe û daniye ser milê xwe, ji her kesî re bi dengekî bilind dibêje: "Ev e Kurdistan... Ev in Kurd!.

Ez nikarim ji vê bêhtir S. Berekat bi xwendevanan bidim naskirin û mixabin wergerandina berhemên wî jî, bi Kurdî zor e, ne ji ber ku zimanê Kurdî qels e. Lê ji ber ku zimanê Selîm yê Erebî xurt û bilind e, Ereb bi xwe lê dimînin ecêbmayî û dibêjin: "S. Berekat ji zûde rişma zimanê Erebî xistiye destê xwe."

Ezê di vê kurtegotarê de hinekî li ser helbesta wî (Mehabad ber bi olîmpiyada xwedê ve) rawestim. Bijartina min ji vê helbestê ji ber Kurdîtiya wê ye. S. Berekat di vê helbesta xwe de, vedigere berî 37 salan, çavikê Kamêra ya xwe dibe ser Komara Mehabad ya ku bi alîkariya dewleta Sovyet ava bû û hilweşiya jî. Dîrok... dinya... tev di vê helbestê de, weke lîstikgehekê ye, fersenda Kurdan jî hatiye ku dakevin meydana lîstikê. Di helbestê de yek diaxive, ew yek miletê Kurd e. Çîroka xwe dibêje, bê çawa ew jî kete olîmpiyadê û çawa tiştek ji xeynî mirinê qezenc nekir.

Piştî Şerê Cîhanî yê duyemîn, gelek komar ava bûn, Kurdan jî Komara Mehabad ava kir.

S. Berekat vê yekê di helbesta xwe de tîne zimên. Li ser zimanê lîstikvanekî hatiye olîmpiyatê, dixwaze xwe biceribîne. Lê ji xwe ne bawer e, ew lîstikvan wiha dibêje:

**Ezê gogan tevan biavêjim**
**Ew gogên ku nîşanê**
**naynin**

Dû re dibêje:

**Û ez li wir im,**
**Parçe me di navbera**
**yên beza de**

Di wê berbanga ku tu kes wiha qezenc nake de!

Selîm bi nav nake, bê kê di wê cirîdê de Kurd/ lîstikvan xapand, lê xuya ye rola Sovyet di hilweşandina Komara Mehabad de hebû, Selîm di helbesta xwe de dibêje:

**Ma ez bibêjim bê çendî**
**cîranan ez xapandim**
**Di vê cerîdê de?!**

Pişt re S. Berekat wiha berdewam dike:

Ma ez alên ku li wê derê bûn, bi nav bikim?
Ma ez yê Kurd bi nav bikim?
Da ku şev xwe bi kirasê wî
yê talankirî, germ bike?!

Di helbestê de yê lîskvan (miletê Kurd) piştî hêvotina derve, biryarê dide ku têkeve lîstikê:

**Ezê vî hesinî hilgirim**
**Li ser wî textê xurt**
**Yê di bin lingê min de**
**diheje**
**.....**
**Ezê sond bixwim**
**Ku ev hesinê hildayî**
**li ser destên min**
**Pêşerojeke şuştî ye**
**Di pişikeke Kurdî de!**

S. Berekat xwendevanê xwe bi bûyerê ve girê dide. Xwendevan bendewariya encama lîstikê dike, ka gelo ev lîskvanê xurt, yê zendên wî badayî, yê ku hêz dide xwe, da ku hesin hilgire û gava xwe ya mezin biavêje (Komarê ava bike), gelo wê bi ser keve û tiştekî qezenc bike, yan wê hestiyê çokên wî di bin giraniya hesin de bişkên?!

Mixabin, ev lîstikvanê xurt, ne amade bû ji hilgirtina wî hesinê giran re (Komar), cîranan (Sovyet) ew xapandibûn, tenê jê re cotek solên sporê û gomlegekî tozgirtî anîbûn.

"Bi vî awayî ez hatim avêtinî nava lîstikê"

Lîstikvan wiha qîrîn dike: "Ew xapandin, jê re gotin: "Tu canbaz î, sivik î. Tê karibî gava mezin biavêjî. Gava mezin nehate avêtin, temaşegeran tev çav berdabûn vî lîstikvanê zendbadayî, yê solên wî ne yê wî bûn. Lê cîranan jê re li ber lingê wî danîbûn, bêguman ew sol ne li gor lingên wî bûn, rihetiya xwe tê de nedidît."

Komara Mehabad hilweşiya, tecruba dewleteke Kurdî ya yekemîn bi serî nebû, di helbesta xwe de S. Berekat bi dilekî şewat vê yekê dibêje:

**Xwedayê min**
**Ev in Kurdên te...**
**Xwedayê min!...**

Pişt re ev gotinê kûr û tijî tên:

**Kurd weke janekê ber bi**
**rastiyê tê...**
**Weke janekê... roj kor**
**derbasî Mehabadê dibe!**

Ma ne rast e?! Kurd heta digihîje rastiyekê, di vê gelek êş û jan û ziyan bibîne, hîn gelek rastî hene, lê ji Kurdan ve xuya nakin.

Ev e Selîm Berekat, yê ku berê zarokekî nehs û afat bû, hîn jî wisa ye, lê di berhemên xwe de, forma nivîsandina wî, ya wî bi tenê ye, poşê xwe li helbestvan û romannivîsên cîhanî yên mezin dixe, gelek ji helbestvanên Kurd yên nûhatî û bi zimanê Erebî dinivîsin, hawê wî dikin (teqlîda wî dikin) lê kesek negihîştiye paya wî.

S. Berekat, hêja ye em wî nas bikin, berhemên wî bixwînin, bêhtir emê xwe nas bikin.

# AZADÎ



**Abdurrahman Durre**

## DGM dê çi bike? Her tişt bûye PKK

Bi rastî jî, Kurdistan bi her tiştên xwe ve bûye PKK û şoreşger, dest avêtiye serhildanan. Bi aşîta xwe, bi ewr û ezmanên xwe, bi gelên xwe, bi war û zozanên xwe, bi rewşenbîr û hozanên xwe, xulase bi her tiştên xwe ve dest avêtiye serhildan û şoreşgeriyê, ceng û azadiyê, demokrasî û mirovahiyê. Bi tenê şêx, mele, kûsî û kêvjal mabûn. Mele jî dest pê kirine hereketa Îslamiya Kurdistanê damezirandine û şoreşa ku Hz. Muhammed li hemberî zilm û cenaweriya dewra cahîliyetê û Ebûcehl kiribû, ew jî li hemberî zilm û barbariya Ebûcehlên ku li Kurdistanê ne, dikin. Di demeke pirr kurt de gihîştine merhaleyeke pirr mezin û girîng. Di her çar parçeyên Kurdistanê de, li Ewrûpayê û li gelek navendên girîng ên alemên Îslamê, bingeh girtine û xebatên zor dikin.

Şape û aşîtên Kurdistanê jî, dest bi serhildanan kirine, ku di herêma Oramara Çiyayê Culemêrgê de, êrîş daye ser qomando û tîmên taybetî; nêzîkî şêst–heftê tîm û qomando mirine, helîkoptereke ku hatiye alîkariya wan jî, ji aliyê bager û dûmana çiyê ve hatiye xistin. Heft leşker hatine kuştin, pîlotê helîkopterê (Yarbay Yusuf Turgut) jî, bi xedarî birîndar bûye û hildane nexweşxaneyê.

***Şape û aşîtên Kurdistanê jî, dest bi serhildanan kirine, ku di herêma Oramara Çiyayê Culemêrgê de, êrîş daye ser qomando û tîmên taybetî; nêzîkî şêst–heftê tîm û qomando mirine, helîkoptereke ku hatiye alîkariya wan jî, ji aliyê bager û dûmana çiyê ve hatiye xistin. Heft leşker hatine kuştin, pîlotê helîkopterê (Yarbay Yusuf Turgut) jî, bi xedarî birîndar bûye û hildane nexweşxaneyê.***

Çendek berê peyka ku hikûmeta Tirk û Fransa bi hev re çêkiribûn û firandibûn asîmanan, ku keşfa PKK'ê û kemînên leşkerên azadiya Kurdistanê pê bikin, ji aliyê firişteyên asîmanan ve hate parçekirin û hate xwar. Yanî firişte jî bûne PKK û alî şoreş û serhildana gelê Kurd û Kurdistanê.

Meseleyeke pêşiyan heye. Dibêjin: "Xwedê ji aliyê rastan e." Li gundê me bi navê Emînê îskan (Rehma Xwedê lê be) kesek hebû wî jî bi Tirkî wiha digot: "Allah itoğlu iti tanir." Yanî Xwedê sebavan nas dike, bi rastî jî wilo ye. Sebav û zalim, sebavîtî û zalimtiya xwe qebûl nakin û xwe neheq nabînin, lê Xwedê wan nas dike û rind jî dizane, di Qur'ana xwe de jî gotiye: "Ezê wan ser serî biqelibînim, wê ew bi xwe jî bibînin." Baweriya me jî ew e, dîroka cîhanê jî wilo bûye, wê wisa be jî. Tu kes bila tu şubhe û teredûdê der barê vê yekê de neke. Ev qanûnekî îlahî û xwezayî ye, nayê guhertin. Lê tiştê ku mirov pirr meraq dike ev e, ku DGM wê çi bike û wê der heqê aşît, şape, bager û dûmanên çiyayên Kurdistanê û firişte û melaîketên asîmanê de çi bike û çilo mehkemeyê veke. Wê alîkariyê ji kê bixwaze?

Zeyneba Zer wê bi kê re bikeve pêwendiyan û ji kê re şorektî û cîlweyan bike, wê bibe aşiq û evîndara kê?

Ew jî, ne xem e, lê ez nizanim wê koçekê me yê Lîceyî çi bike? Bi rastî jî ku Xwedê mirov şaş bike, wilo beropaş dike, ku êdî nizane çi bike. DGM û Zeyneba Zer wê çi xeltî bikin? Hem şaş bûne, hem palorkaş bûne, hem jî fahş bûne.

# Şîzofrenî û konevaniya Tirkiyê

**Yekda Welat**

Şîzofrenî nexweşiyeke giran a psîkatrî ye. Yekî şîzofren di livandin (motorîk), hizrandin, mejû, dîtin, rêxistin û têgihîştinê de anormalî, nerastiyê diyar dike. Car caran tiştan di mejiyê xwe de çêdike. Wek mînak, hespên ku difirin dibîne, ji kesî bawer nake, li her cihî dijmanan dibîne, reng jê re diaxifin û hwd.

Mirov dikare bi kurtayî bibêje: Mirovekî şîzofren bi her awayên xwe ji jiyaneke civakî û "real" dûr e. Axaftin, livbazî û dîtinên wî "ne normal in". Beriya sed salî ji wan re digotin: "Ev, mirovên dîn in."

Konevaniya Tirkiyê jî, li gorî zagonên civakî, ramanî, konevanî û zanyarî "ne normal e". Li ser hingavtin, qirkirin, girtin û hovîtiya dewleta Tirkiyê naxwazim bi pirranî rawestim. Xwendevanên me, kêm zêde di vê xalê de têgihîştine. Lê dîsa jî ev berhemên hovîtiyê encamên konevaniyeke şîzofren û paranoya ne.


Konevaniya dewleta Tirkiyê rezîltî ye û gelê Tirk û Kurd her roj rasterast (dîrekt), an jî veşartî (îndîrekt) tên êşandin û bi şêweyekî negatîv tên guhertin.

Bi destpêka şerê çekdarî li Kurdistana bakur di sala 1984'an de cara yekemîn komeke Kurd bi hêz, quwet, bi rêxistin, dîsîplîn û jîrbûn li dijî leşkeriya Tirkiyê derket. Cara yekemîn e ku leşkeriya Tirkiyê li dijî hêzeke wiha giran radiweste. Ev ne şerê Qibris û serhildanên Kurdan yên kevin in, ku leşkeriya Tirkiyê di demeke kin de bi hovîtî hemûyan wêran bike. Leşkeriya Tirkiyê çi jî bike, dawî windakirin e. Konevaniya Tirkiyê her dem konevaniyeke leşkeriyê ye. Leşkerî konevaniya Tirkiyê dimeşîne. Di konevanî û heftê saliya Tirkiyê de leşkerî kirine "ziyaretî". Ev hêz û nîşana Tirkiyê, "Mehmetçîk", ji aliyê artêşa Kurdan (ARGK) ve hatine rawestandin û rûxandin. Êdî kompleks û sendromên mezin di nav leşkeriya Tirkiyê de tên diyarkirin.

Şîzofrenî û paranoya di nav leşkeriyê de cihê xwe girtine. Leşkerên Tirk di xewnên xwe de gerîla dibînin, vediciniqin, ditirsin, xwêdan didin, dikevin nav panîkê, nexweş dikevin... Bi hêrs dibin û li dijî serokên xwe derdikevin. Pêwendiyên leşkeran yên malbatî û civakî dihejin. Hejmara dermanên li dijî tirsê wek antî-depresîva, trîzîkîla, morfeyum, narkotîka û kokaîn pirr zêde bûye. Vexwarina alkolê çar caran ji berê zêdetir bûye. Di wan salên dawî de ev pirsgirêk wiha zêde bûye ku êdî revîna "Mehmetçîkan" ya ji leşkeriyê nayê veşartin.

Ji bo gelê Tirk ev tiştekî nû ye: "Mehmetçîk" jî ditirsin, jî dimirinê û direvin. "Mehmetçîk" bêmoral, paranoya, antî-sosyal û depresîv in,.. Baweriya leşkeriya Tirkiyeyê dilerize, dimire. Leşkerî ya Tirkiyeyê ketiye astengiyên wisa mezin ku heta bargeha Zelê difire, dîsa gelê xwe dixapîne, dîsa derewan dike. Ku wiha dom bike dibe ku balefirên xwe bi şînê Alaskayê û bibêje min derbeyek li Kurdan daye.

Konevaniya dewleta Tirkiyê hatiye vê dereceyê ku wek roviyê qudusî li dora xwe kê dibîne gez dike. Şîzofreniyê xwe ewqas di nav serokatiya Tirkiyê de belav kiriye, ku mirovên wek Turgut Özal, Eşref Bîtlîs... û nûnerên Meclîsa xwe dide kuştin



Alfabe yên rojnameya Gündem û Welat tirsê dikin dilê dewleta Tirkiyê, ku rojnamevanên Gündemê dikuje an jî dike girtîgehê. Ji rastiyê ditirse û direve.

Konevaniya dewleta Tirkiyê bixwe şîzofren û paranoya ye. Polîtîkvanên Tirkiyê xwe kirine çarçoveyeke pirr teng û lewre jî wiha teng dihizirin. Konevaniya kemalîzm bi xwe pirsgirêkeke pirr mezin e. Azîneyên kemalîzmê li gorî jiyana civakî paradoks e. Di konevaniya kemalîzm de rista gel nîn e, bi dogmatîzm, tirs, qirkirin, înkarkirin û qedexekirina axaftina serbest, gel kontrol dike. Kî rast biaxive terorîst e, dijminê Tirkiyê ye. Cîhana xiristiyan 500 salî înkar dikir ku cîhan girover e û cîhan li dora rojê digere. Mirovên zanyar wek Galîle Galîlo hatin girtin û windakirin. Dewleta Tirkiyê jî îro ku em bi aliyê sala du hezar ve diçin wê konevaniyê, dimeşîne. Rewşa Tirkiyê wisa xerab bûye, ku êdî manyak, dîn, bêaqil, psîkopat, mirovên nevrotîk serokatiya Tirkiyê dikin. Serokên dewleta Tirkiyeyê bixwe pirsgirêk in. Ewê çawa pirsgirêkên civaka xwe çareser bikin.

Xanim Çiller li ku derê be, her dem dikene, diçe Bosna Hersekê zarokên nexweş û birîndar dibîne û dîsa dikene... bi dirûşman (sloganan) diaxive. Profesora aboriyêye "xwendiyê" û Tirkiyê dike aloziyek pirr mezin. Car caran xwe winda dike û bawer e di fîlmekî Hollywood de dileyize. Mirov nizane jin e an jî jinik e... Ecevît wek psîkopat li her derê Ermeniyan dibîne. Her dem dijmin ji derve tê... Demîrel bi xwe nizane pozîsyona wî çi ye, delameta wî çi ye, sultan e an jî... Alparslan e xwe wiha dilivîne ku mirov bawer e jê re gur çêbûne, nikare baş rûne û baş rabe, çi dike xelet e..., Karayalçin,... Doğan Güreş...

Di helbesteke hunermendekî Kurd yê bênav de, ku bixwe di dema Serhildana Şêx Seîd de cihê xwe girtibû. Ev helbest baş pirsgirêka siyasetvan û serokên Tirkiyê diyar dike:


Eger çêbikî ji bo dahşê kera re
Ji zêr afir di nav eywana qesrê de
Di şûna ce de bide wî lewz û xurme
Nemanî Sanî jê re bike saye
Fêr bike wî Eflatûn di ramanî de
Îbn Sîna jê re bibe mamoste
Bide wî şahde (dîplom) a herî mezin û gewrê
Lê meke hêvî ku ev xwedî huner be
Dema tu wî ji eywanê derxînî
Ji wî nayê hîç huner, xeyrî zirinî.

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**

**Çeperast:** 1–Pêşnavê jina Dr. Dêrsîmî, ku di sala 1993'yan de çû ser dilovaniya xwe. Di wêneyê de tê dîtin/ Beden 2–Dad/ Navê mêrekî 3–Rajor/ Kirin û gotinên ku ji bo Xwedê tê kirin 4–Şuphe/ Keder,elem (berevajî) 5–Zik/ Aleteke cotkirinê/ Kurtenavê Partiya Karkerê Kurdistanê 6–Maç 7–Di felsefeyekê de raman 8–Navê navçeyeke Wanê 9–Navê mêrekî/ Pêxemberê Xirîstiyanan 10–Li Tirkiyeyê kanaleke televizyonê/ Danekî rojê ku hingê tav bi temamî diqulibe

**Serejêr:** 1–Seramîk/ Kurtenavê ajanseke nûçeyan 2–Tewir, helwest/ Teslîm 3–Tiştê ne çewt/ Li hin herêmên Kurdistanê di şûna mirov de tê bikaranîn 4–Bi Tirkî û, bi... re 4–Pirça nerm û ziravl/ Sembola santîmetre 5–Xwestî 6–Bi Tirkî goşt/ Kurtenavê Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (Bi Îngilîzî)/ Xwarina êvarê 7–Bawerî/ Kûçik 8–Kinc, cil/ Meheke demsala biharê 9–Hêsan 10–Bextiyar 11– Mirov tê de dew dikile 12– Lêçûyî, mexlûp



**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Jozef Stalîn 2–Îronîk/ Rodîk 3–Got/ Ho 4–Kal/ Îrlanda 5–Anot/ Anemîk 6–Jiyan 7–Dîrayet 8–Ar/ Adetî 9–Atlêt 10–Antî/ To


**Serejêr:** 1–Ji/ Kar 2–Organ/ Dran 3–Zoolojî/ TT 4–Ent/ Giralî 5–Fî/ Yadê 6–Skor/ Ayet 7–Lanet 8–Arvan/ Tîfo 9–Lo/ Ne 10–Îd/ DM 11–Nîhaî 12–Ko


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat
Nav:
Paşnav:
Navnîşan:
**Bedelê abonetiyê razînin:**
**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437
**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342
Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.
**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |




# Serpêhatiya tiliyan

Tiliya qelîçan (biçûk) ji hevalên xwe re dibêje:

– Em birçî ne û tiştekî me jî tune ku em bixwin

Tiliya gustîlkê bersiva wê dide:

– Li vir di tebeqa çaran de malek heye û dolaba wan tije xwarin e. Îro xwediyê malê jî ne li mal e. Em herin diziyê! Lê, xanî gelekî bilind e. Ji bo ku em hilkişin tebeqeya çaran, ji me re pêlikeke gelekî dirêj divê.

Tiliya dirêj bi kêf dibêje:

– Ma ji min dirêjtir yek heye? Werin em herin û hûn her çar di ser min re hilkişin tebeqeya çaran. Xwarinê bigirin û bînin. Em bixwin.

Tiliya îşaretê dibêje:

– Ma hûn ji Xwedê natirsin û diçin diziya xelkê?


Tiliya beranekê bi hêrs bersiva wê dide:

– Ma em ji birçînan bimirin? Ka em çi bikin? De bibêje!

*Li mînakê binêre û numereya her wêneyî li hember navê wê binivîse!*

| | |
|---|---|
| Perçemek | .......4...... |
| ker | .............. |
| axtepot | .............. |
| gur | .............. |
| gakûvî | .............. |
| rovî | .............. |
| kergedan | .............. |
| jûjî | .............. |
| pezkûvî | .............. |
| hespêavê | .............. |
| simore–pilûr | .............. |
| kusî | .............. |
| şêr | .............. |
| fîl | .............. |
| hirç | .............. |






# Ala Kurdan

Her neteweyek xwedî alekê ye. Al, sembola neteweyê ye. Her netewe bi ala xwe tê naskirin. Di civîn, konferans û pêşbirikên sporê yên navneteweyî de, her kes û komik bi ala xwe beşdar dibe.

Ala me Kurdan jî heye. Ala me rengîn e. Ji ber vê yekê jî, em ji ala xwe re dibêjin "ala rengîn". Rengên ala Kurdan ji jor ve ber bi jêr sor, spî û li ser spî jî wêneya rojê bi rengê zer heye. Li herî jêr jî, rengê kesk heye. Yanî ala Kurdan ji rengên sor, zer, spî û kesk çêbûye.

Her rengek sembolek e. Rengê sor sembola dîroka Kurdistanê ye. Xwîna şehîdan e. Sembola rojên pêş e. Rojên ronahî û xweşiyê ye. Di Kurdistaneke serbixwe de, di nav aştî û aramiyê de jiyan e. Jiyana wekheviyê ye. Kesk jî, sembola dewlemendiya xwezaya (natura) Kurdistanê ye. Rengê kesk sembola deşt, çiya, ax û avbaya Kurdistanê ya bi ber e.

Wek her neteweyî, em Kurd jî, bi ala xwe serbilind û serfiraz in. Ew sembola welat û neteweyê me ye.



Boyax bike!

wateyên van bêjeyên jêrîn li hember wan binivîse.

| | |
|---|---|
| Spartin | .......... |
| avba | .......... |
| aştî | .......... |
| aremî | .......... |
| beşdar | .......... |
| dîrok | .......... |
| wekhevî | .......... |
| netewe | .......... |
| navneteweyî | .......... |
| pêşbirik | .......... |
| serfiraz | .......... |
| serbixwe | .......... |
| wêne | .......... |

## Ji ber eşqa Ewrûpayê gelek pêşmergeyên başûrê Kurdistanê li kolanê Stenbolê ne!

# Pêşmergeyên doh li Stenbolê bûne firaqşo

*Bi awabûna Hikûmeta Federe ya Kurdî, Kurdên Başûr gelek kêfxweş bûn û her tim wiha digotin: "Me bi xwînê Kurdistan rizgar kir." Gelo niha rewşa vî xelkê ku wiha digot çawan e çi dikin?*

**"Kurdistan bi nav azad, lê mixabin gel ne azad e."** *Ev gotin ji devê xortekî başûrê Kurdistanê ku, 8 sal li serê çiyayên Kurdistanê pêşmergetî kiriye derketin. Kurdistan çima azad e û gelê wê ne azad e. Di şerê Sedam û partiyên Kurdistanî de, gelê Kurdistana Başûr bi heyî û tuneyiyên xwe ve li hember Sedam sekinîn û piştî bi 10 hezaran şehîdan Hikûmeta nehatine Federe ya Kurdistanî ava kirin.*

*Bi vê yekê gelê Başûr hem ji şer êşiyabû û hem jî di serxweşiya serfiraziyê de bû. Û hêviya rojên xweş dikirin. Lê piştî bi çend mehên ku di ser Komara Federe ya Kurdistanî de derbas bûn, diyar bû ku Komara Federe daxwazên gelê başûrê Kurdistanê cih. Hevalekî ku me pê re xeber da û li başûrê Kurdistanê 4 sal pêşmergetî kiriye, der heqê vê yekê de wiha digot:* **"Niha jixwe, ambargo li ser Iraqê heye û ambargoya Sedam jî li ser Kurdistanê heye, înca ambargoya Mesûd Berzanî (Serokê Partiya Demokrata Kurdistanê) û Celal Telabanî (Serokê Yekîtiya Niştimanê Kurdistanê) jî li ser gel heye."** *Wî gotinên xwe didomand û digot: "Yaho ez newestiyayî me, ku pêwistî bi min hebe, sibehê dîsa ez radihêjim çekên xwe û ji bo Kurdistanê şer dikim. Lê ku kurê M. Berzanî bi mersedesê bigere, kincên paqij lê bin, her tişt di bin emrê wî de be û ez feqîrê Xwedê li welatê xwe nan ji bo xwarinê nebînim û bêm kolanên Stenbolê bi du milyon pere koletiyê bikim, ev nayê qebûlkirin. Lewre niha sermayeyê Telabanî û Berzanî têra aboriya Kurdistan tevde dike. Qey ev heqê Xwedê ye?"*

*Ji bo vê rewşa han me xwest em bibin mêvanên çend heval ên Başûr ku niha li Stenbolê di nava neçariyê de û li ser riya Ewrûpayê ne û bi wan re biaxivin.*

**"Kurdistan bi nav azad, lê mixabin gel ne azad e."** *Ev gotin ji devê xortekî başûrê Kurdistanê ku, 8 sal li serê çiyayên Kurdistanê pêşmergetî kiriye derketin. Kurdistan çima azad e û gelê wî ne azad e. Di şerê Sedam û partiyên Kurdistanî de, gelê Kurdistana başûr bi heyî û tuneyiyên xwe li hember Sedam sekinîn û piştî bi 10 hezaran şehîdan Hikûmeta Federe ya Kurdistanî ava kirin.*



**Pêşmergeyên ku ji Başûr tên Stenbolê sebeba vê koçberiya xwe êdî zehf bi rewşa avborî ve girê didin.**

*Keko navê te bixêr?*

– Navê min Fermander.

*Hûn ji kengê ve li vir dijîn?*

– Bû pênc meh.

*Sedema hatina we ya vir çi ye?*

– Aborî... Aborî... Aborî.. Tenê ji bo meseleya aborî ez li vir im.

*Bi çi awayî hûn têne vir, ango ji sînor derbas dibin?*

– Bi qaçaxî..

*Hûn dikarin derbas bibin? We nagirin?*

– Ku bigirin efû nakin...

*Li Tirkiyeyê hûn bi qaçaxî digerin, dixebitin tu problem dernayê ji bo we?*

– Ê me jixwe ger tune, tenê diçin kar û têne malê, lê carina di riya mal de polîs ji me nasname dixwazin.

*Hûn çi dikin?*

– Ji ber ku ji me fêm nakin me berdidin. Tenê carekê ez birim qereqolê pere ji min xwestin.

*Te da wana.*

– Qey heye.. Ezê çi bidim wan.

*Hûn li vir çi karî dikin.*

– Di lokantayekê de firaqşoyî?

*Hûn çiqas pere distînin?*

– Mehê 2 milyon.

*Têra we dike?*

– Ji bo xatirê malbata xwe dikim. Li Başûr li benda pereyên min in.

*Hûn dikarin pereyan zêde bikin û bişînin Başûr?*

– Ku em mecbûr bin,

*We pêşmergetî kiriye?*

– Belê 5 sal di nav YNK'ê de.

*Niha Kurdistan azad e. Lê hûn li vir in ji bo çi?*

– Ya rastî çi ye hûn zanin? Armaca min ew bû ku biçim ji bo Ewrûpayê. Yanî rastî ew e ku em reviyan e.

*Ji başûrê Kurdistan roj bi roj ji her cure însan tên Tirkiyeyê û tev jî bi armanca çûyîna Ewrûpayê, çi heye di Ewrûpayê de?*

*(Vê pirsê kek Heyder xwest bibersivîne).*

–Rast e, Kurdên Başûr îro direvin. Lê ev nayê wê maneyê ku me dev ji şoreşgeriyê berdaye. Wexta di ruhê mirov de şoreşgerî hebe, dixwazî bila li Başûr be dixwazî bila li Tirkiyeyê an jî Ewrûpayê be, kar û xebatên xwe didomînin. Kurdên Başûr îro li Ewrûpayê gelek komel, avahî û hwd. ava kirine. Ev ji bo çi ye? Qey ne ji bo Kurdan e? Ez dixwazim vê yekê bibêjim kîjan Kurd ji Başûrê derket, here ku dîsa ji bo Başûr dixebite..

– *( Bavê Hoşment jî li ser vê pirsê wiha got):* "Rast e, em ji bo Ewrûpayê hatibûn. Bi rastî rewşa min a aborî li Başûr gelek baş bû, lê min xwest ku herim Ewrûpa. Ji ber ku me nikaribû em herin Ewrûpayê niha li Tirkiyê me... Û bi du milyonî heta êvarê firaqan dişom.

*Keko rewşa te ya aborî her baş bû, çûyîna Ewrûpayê ji bo çi?*

– Çûyîna Ewrûpa ji bo min hewesek bû. Ji berê ve min ew der meraq dikirin. Ez berê çûbûm Rûsya û Yewnanîstanê jî lê min dixwest herim Ewrûpayê jî bibînim.

*Hûn bi serê xwe ne?.*

– Na, wele bi malbat im. Jin û zarokên min jî li vir in.

*Ew jî li ser meaşê te ne?*

– Belê belê..

*Têr dike?*

– Ji mecbûrî.

*We jî pêşmergetî kiriye?*

– Belê, ji sala 1983'yan ta 1990'an ez jî di YNK'ê de pêşmerge bûm.

*Va ye hûn neçûn Ewrûpayê. Hûn karin li vir bisekinin?*

– Me biryar daye ta meheke din ku em neçin Ewrûpayê emê dagerin Başûr dîsa.

*Ji sînorê hûnê derbas bibin? Wekî din wê Başûr we qebûl bike?*

– Erê, erê. Kengê em bixwazin dikarin dagerin Başûr. Wê me qebûl bikin.

*Hevalên Başûrê dixwestin gelek tiştan bibêjin. Lê di dilê wan de hinek jî tirs hebû. Lewre ku wexta hevalekî dixwest hin tiştan bibêjin, hevalên wî bi îşaretên çavan ew îkaz dikirin û nedihiştin ku dilê xwe vala bike...*

*Di vî xaniyî de hûn çend kes dijîn?*

Heyder: 4 li wê odê, 5 li wê odê, 2 li salonê, 3 jî li oda biçûk tev de 14 kes.

*Kirya xanî çiqas e?*

– Serê mirovê 250 hezar e.

*Li gor dîtina we, jiyana Tirkiyeyê çawa ye?*

– Pirr zor e.. Ji aliyê aborî ve pirr xerab e.

*Çawa?*

– Li ber çavan e, tiştekî veşartî jî tune. Şerê ku îro li bakurê Kurdistanê dimeşe wek gelê Kurd, gelê Tirk jî şepirze kiriye. Em li cihê kar dibînin, temamî hatina Tirkiyeyê li gor şer tê kifşkirin, her roj zem tê ser tiştan. Êdî zehf jî li tiştên xwarin û vexwarinê bi biha dibin. Û meaşê her kesî kêm e. Karker û karmend li piyan e. Birçî ne.

*Hûn ji bo PKK'ê çi dibêjin?*

– Heyder Şemal: %100 baş e...

– Letîf Şefîn (Bavê wî di şerê sala 1974'an de şehîd bûye): Gelek baş e. Jixwe di nava rêxistinên Kurdan de yê ku herî baş şopa Marx û Lenîn didomînin PKK ye. Min bi xwe li Başûr "Kapîtal" û gelek pirtûkên sosyalîstî û zanistî xwendine. Bi rastî tiştên ku niha PKK dike doza sosyalîzma zanistî ye.

*Wê çawa çêbibe?*

– Keko dijmin diyar e. Ger hûn Kurdistanê nas bikin, hûnê lîstikên dijmin bibînin. Li Başûr zalimê Sedam ji bo ku boriyên petrolê (neftê) di nava axa Kurdistanê de derbas nebe, berî çend salan hewçend mesref kir û borî di nava erdên Ereban de kişandin. Li Bakur jî rewş ne çêtir e. Îro li yek bajarekî Kurdistana Bakur fabrîqeyek hêja tune ye. Kafirbavên Tirkan tev di metropolên Tirk de avahî û fabrîqeyan çêkirin.

Îran jî çêtir nîn e, Sûriye jî wiha ye. Ev tesadûf nîn e. Bi zanîn e. **Wê bidome**

***Roportaj:***
***Salih Günbat – Pisman***


welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tigris
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık